

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

hejmar 76 | 2020



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 76 | 2020

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Fatos Koyuncuer Brunner, Bêrivan Keskin,
Dr Mikailî, Seyfi Doğan, Mûlla Evîndar, Ecevit Yıldırım,
Hizir Akbina, Rohat Alakom, Mem Xelîkan, Nuh Ateş
Mûlla Evîndar, Xelle Girdê (Kartzade Halil), Xalit Temli
Adem Özgür, Rûjhat Esiman, Îhsan Türkmen,
Rohat Miran, Perin Esmeroglu, Mehtab Îdeli, M. Hesko

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Basku: Apec-Tryck AB



Afişê filmê Xalko

Wêneyê berga pêşîn:

Wêneyek ji gundê Încovê, sal 1938.

Ji aliyê çepê ve: Topê, Elife û Zuhre,

ji malbata mala Qerto.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn,

serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin ji, li xwediyar

nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ji bîrnebûnê, Alî Çiftçî	4
Îskana kurdên şêxbezenî (şêxbizin) li Anatolîyê, Dr Mikailî	6
Hevpeyvînek bi derhêner Samî Mermer ra, Adem Özgür	23
Bîranînên Fikret Çêşmeli, Rohat Alakom	27
Colo -2, ÎhsanTürkmen	31
Belgefîlma Hevalê Bargiran hat mêrandin, Ecevit Yıldırım	35
Malbata Toktamiş Ateş, Xelle Girdê (Kartzade Halil)	36
Zimanê min çawa ji ber destên min çû?, Rohat Mîran	39
Vegere, Mem Xelîkan	42
Li vî warî, Mem Xelîkan	43
Ew di şevên tarî de stêrka sibê bû, Xalit Temlî	44
Reşo -3, Ecevit Yıldırım	47
Kurdîzwanî û kultûrmendî, Rûjhat Esîman	54
Şofêrên berê yên alîyê me, Hizir Akbina	58
Pêkenok, Hizir Akbina	65
Çarîn, Mûlla Evîndar	66
Ji vir û ji wê, Nuh Ateş	67
Tiştên ku wînda dibin - Dawetên berê, Fatos Koyuncuer Brunner	70
Quto, Seyfi Doğan	72
Helbest, Bêrîvan Keskin	73
Kumsorik, Nuh Ateş	74
Ziman, Abdalbaki Xalisinan	79
Em canbeg in, Abdalbaki Xalisinan	80
Çend stran ji gundê Hesina, Berhevkar: Mehtab Îdelî	81
Kerpîç, Perîn Esmeroglu	83
Efrîn, M. Hasko	85

Ji bîrnebûnê

Sala nû, dehsalên nû, hêviyên nû

Herçiqas ne li gor salnameya kurdî ya kevn be jî, me sala 2019an bi xwaşî û nexwaşîyên wê ve li pişt xwe hişt.

Di dehsalên bihurî de, li Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li ser axa Kurdistanê gelek tişt qewimîn. Kêm û zêde wekî wan dehsalên derbasbûyî, li van dehsalên pêş me jî pir tişt ê bibin.

Salên 2010an: wê hingê li dunyayê çi xuya bû? Di van dehsalan de ji ber krîza aborî û koçberiya ji Afrika û Rojhilata Navîn hişt ku li Ewropayê partîyên rastgir û populîst pêl bi pêl pêşkevin û pêşketin jî.

Di van dehsalan de li seranserê cîhanê gelek tevgerên ji bo mafên mirovan, ji bo demokrasî û avhewayê li kolanan serî hildan.

Li Başûrê welêt referanduma dîrokî çêbû. Li Rojava bi krîza Surîyê re bajarên kurdan ji alîyê Tirkîyê ve hatin dagirkirin. Li Bakur dewleta tirk şaredarîyên hemû bajarên kurdan bi darê zorê ji destê kurdan girtin.

Li van deh salên li pêş me, hêviyeka mezin ji bo serkeftina kurd û kurdistanîyan heye. Piştî serkeftiyên kurdan li hemberî hêzên dewleta îslamî li Başûr û Rojava, ji bo kurdan navekî baş çêbû. Ev serkeftin û berxwedana gelê kurd li seranserê dunyayê empatîyeka mezin

peyda kirîye. Eger em wek kurd vê empatîyê baş bi kar bînin û li hev xwedî derkevin dê ev deh salên pêş me bibin salên serkeftina kurdan.

Di vê hejmarê me ya Bîrnebûnê de birêz, Dr Mikailî li gor belge-namêyên arşîva Serokwezerata Tirkîyê, bi sernivîsa *Îskana kurdên şexbezenî (şêxbizin) li Anatolîyê* qala îskana mecbûrî ya şexbezenîyan li Anatolîyê bi pêşgotinekê li gel orijînalê belgeyan hem bi kurdî hem jî li gel zimanê orijînal a osmanî amade kiriye. Bi vê re şexbizinîyên li min-tîqa Heymanayê gund bi gund li gor eşîr û bawermendîya mezhebî şematîk hatine nivîsandin.

Di van salên dawîn de di warê sinemayê de derhênerên kurd berhemên balkêş amade kirine. Yek ji wan jî Samî Mermer e, ji gundê Qulto (Sağlık) ye. Gundê wî girêdayê Cihanbeylîya Konyayê ye.

Hevkarê kovara me rojnameger Adem Özgür hevpeyvînek bi Samî Mermer ra kiriye. Di wê nasandin û sohbetê de agahdarîyên balkêş hem li ser jiyana derhênerê hêja Samî Mermer û hem jî li ser hunera wî ya filmî de hene.

Fikret Çeşmeli ji gundê Kozanlıyê 1975an de hatiye Swêdê. Kalikê Fikret di sala 1924an de ji Agiriyê (Qerekosê) koçberî Anatolîya Navîn dibe û li gundê Kozanlıyê bi cih dibe. Bavê Fikret Muharrem jî di sala

1966an de ji bo kar tê Swêdê. Fikret di sala 2015an de bîranînên xwe bi swêdî nivîsîye û wek kitêb bi navê *Brinnande snö och torrt regn mellan två kulturer* (Di navbera du çandan de berfa bipêt û barana ziwa) hatiye belavkirin. Birêz Rohat Alakom bi sernivîsa *Bîranînên Fikret Çêşmeli* hem ev kitêba daye nasandin û hem jî beşek ji vê bîranînê ya bi navê “*Pîzexaneya Tommy*” wergerandiye kurmancî.

Îhsan Türkmen serpêhatiya Colo bi sernivîsa *Colo-2* berdewam dike.

Birêz Xelle Girdê li ser eşîrên Încovê kurtenivîsek bi navê *Malbata Toktamış Ateş* nivîsîye û bi çend wêneyên ji salên 1930-1970 di vê hejmarê de hatiye weşandin.

Rohat Mîran bi sernivîsa *Zimanê min çawa ji ber destên min çû?* balê dikişîne ser girîngîya zimanê dê. Di vê kurtebîranîna xwe ya dema destpêka dibistanê de, bahs dike ka çî bi serê wî û zimanê wî de hatiye. Di vê nivîsê de pîranîya kurdan dikarin xwe bi hêsanî tê de bibînin.

Xalit Temlî yek ji şagirdên Seyid Alp e ku dibistana mamosteyî li Kirşehîrê xwendîye. Bi sernivîsa *Ew di şevên tarî de stêrka sibê bû* bîranînên xwe yê wê wextê nivîsîye û bi çend wêneyan ve xemilandîye.

Ecevit Yıldırım bi kurteçîroka xwe ya bi navê *Reşo-3* di vê hejmarê de berdewam e.

Rûjhat Esîman bi kurdîya şêx-bizîni nivîseka rexneyî û dîtînen xwe bi navê *Kurdîzwanî û kultûrmendî* nivîsîye.

Hizir Akbîna li ser meslega şofêrî-yê lêkolînek bi navê *Şofêrên berê yên aliyê me* bi çend wêneyên kevn ve amade kiriye û ji bo lêkolîna xwe bi Hacî Yusuf Îlhan re jî sohbetek kiriye.

Fatos Koyuncuer Brunner bi sernivîsa *Tiştên ku wînda dibin - Dawetên berê*, balê dikişîne ser edetên zewac û dawetên me ka çîng hatine guhartin.

Nuh Ateş, bi sernivîsa xwe ya *Ji vir û ji wê*, Mulla Evîndar bi çarînen xwe, Seyfî Doğan bi kurtehelbestên xwe yê bi navê *Quto*, Berîvan Keskin, Abdulbaki Xalisinan, Mem Xelîkan bi helbestên xwe ev hejmara dewlementir kirine.

Nuh Ateş çîrokeke almanî ji yê Grîmm a bi navê *Kumsorik* ji bo dîyarîya şagirtên dîrsa kurdî û mamosteyên wan li bajarê Schweinfurtê-Almanyayê bi taybetî ji bo wan ji almanî wergerandiye kurdî.

Xwendevanên bi rûmet, dema me ev hejmara amade dikir li Elezîzê (Xerpêt) zelzele bû, mirî û malwêranî dîsan di ser însanên me de hat li vê zivistanê!

Em ji malbatên mirîyan re dibên: serê we sax be û êşa we ya me ye.

Alî Çiftçi

Li gor belgenameyên arşîva Serokwezerata Tirkîyê-3
(T.C. Başbakanlık Arşivleri Genel Müdürlüğü)

Îskana kurdên şêxbezenî (şêxbizin) li Anatolîyê

Dr. Mikâîfî

Em di vê hêjmarê da dixwazin ji we ra li gor belgenameyên arşîva Osmanîyan, qala îskana mecbûrî ya şêxbezenîyan li Anatolîyê bikin. Ji ber ku di dokumentên arşîvan da navê wana bi piranî wek bezen, bazen yan jî şeyh bezenli derbas dibe, me jî ew wekîna bikaranî. Ew îro, li Tirkîyê weka ,şeyhbizinli‘ tên nas-kirin û binavkirinê.

Em pê dizanin ku ew berê ji navçeya navbera Silêmanî û Kerkûkê, Bazeyanê tên. Meriv dikari bêje bazeyan him welatê wan yê kal û pîran e, him jî bi vî navî hatine naskirinê yane şêxe bazeyanê ne. Gundên kurdên kurmancan yên li dorberî wana, ji wan ra şaxzunîya, şêxzînîya jî dibêjin. Şêxbezenî navê federasyonekê, komeka êl û berên kelxur û lekîya ne. Di belgeyên arşîva Osmanîyan da qala kurdên lekvanîk yanê qala kurdên şêxbezenî tê kirinê. Li Heymanê ev êlên li jêr, di bin navî şêxbezenî (Şeyhbizinli) hene:

Palani,
Jerdekani (Jirkî),

Lerî,
Şawlu,
Kelatî,
Quseyî,
Kerkukî,
Silênî-Nofelî,
Xêwendî(Hemawendî).

Qasi ku em di belgeyên arşîvan da dibînin, ew jî di dema îskana canbegîyan (Cihanbeyli), reşîyan û êlên din va bi hev ra li Anatolîya Navîn hatine îskan kirin. Di belgeyeka arşîvê da navê boybegîyekî şêxbezenîyan derbas dibe; Hacı İsmailzade Mehmed Bey. Lê gelo ew ji kîjan gundî yan jî êla şêxbezenîyan e? Îro meriv û paşmayîyên wî kî ne em nizanin. Dibe ku kesek ji merivên wî vê nivîsê bixwîne û ji me ra bibêje.

Navenda wana Heymane ye. Îro li navçê û 33 gundan jî êlên şêxbezenîyan dijîn. Ji wana çar gund bi Kulu û gundek jî bi Polatliyê va girêdayî ye (Binêre: Lista gundan). Li navenda Ankarayê, taxa Altındaxê jî ji berê da komeka şêxbezenî bi cîh bûne û piranîya

wana ji alîyî ziman da asimîle bûne. Bireka wana 13 gund sûnni-şafîî û 18 gund jî sûnni-henefî ne û 2 gund jî henefî û şafîî tevlihev in. Hîn berî îskana kurdan ya mezin û dawîn li Anatolîya Navîn û roava jî pir êl û berên kurdan û kurdên şêxbezenî hatine Anatolîyê, nav erdî dewleta Osmanîyan. Hinik ji wana hetanî Ergene ya Tekirdagê çûne û îhtimaleka mezin li wir jî bi cîh bûne. Li Çukurovayê jî qala lekvanikan hatiye kirin. Li Erxanî, Xarpêt, Sîwerek û heta Erzurum û Qersê jî belaw bûne. Dîsa hin ji wana di bin îdara Mîrtîya Canbegan da û bi hecîbî, mikailî, şêxkî û etmanîyan va tevhev ji bo pezcêrandinê, derketine zozanan, çûne dorberî çîyayên Aydos (Aidos)

li bajarî Çerkeşê û birek ji wana, ji wir jî derbasî Sinopê bûne û li wir mane. Ev bi destûra padişêh bûye. Kurdan ji bo vê bac yanê vergî dane dewletê (Ağnam Rûsumu= Hayvancılık Vergisi).

Wekî din li bajarên Samsun-Bafra, Düzce, Kastamonu- Araç, Çorum, Amasya û Çankiriyê jî çend gunden şêxbezenîyan hene. Ew gundana jî di heman wext û dewrê da bi ferman û kontrola dewleta Osmanîyan da ava bûne.

Şêxbezenîyên Düzce/ Adapazari

Ew li piştî îskana li Heymanê, wexta derdikevin zozanên Çerkeşê, komeka ji wana ber bi Trakyayê va terin û dûra li ew derana têne îskan



Şêxbezenîyên Düzceyê

kirin, bi şûn kirin. Li gor du dokumentan îskana wana li Îzmid û Düzce bi sistemeka resmî bûye. Di belgenameyê da qala îskana 69 malan tê kirin. Li gor agahdarîyên şêxbezenîyên Düzce hejmara wana îro digêje 10 000 kesî, li du taxên Düzce, wek Camikebir û Çay Mahallesiyê rûdinin, xanenîşin in. Ew li şeş gundên Düzceyê jî bi cîh bûne. Navê va gundana; Bahçeköy, Paşakonaği, İçmeler, Mahmure, Tınaz ve Ballica .

Birek ji wana jî dîsa ber bi Behra-reş çûne, li Bafra-Samsun, Boyabad û Durağan a Sinopê mane û gund ava kirine.

Gundê li Boyabatê;

Yeniköy, Binerli, Bayamca, Yeşilyurt

Gundê li Durağanê:

Olukbaşı, Çayağzı gundê şêxbezenî ya herî mezintirin ya li Sinopê ye. Bi tevayî îro hêjmara şêxbezenîya li Sinopê qasî 40.000 - 50.000 hezar e. Li salên dawî li hemberî va şêxbezenîyana êrişên tirkên nijadpe-rest bûn û xwestine wana ji wir derxînin, bavêjin.

Gunde şêxbezenîyan li Çorumê;

Çorum navçe: Gemet

Laçin: Çamlıpınar, Sıtma, Karasoku

Kargı: Beygircioğlu

Osmancık: Li vir jî çend gund he-ne, le nav nenasin.

Li gor belgenameyên dîrokî şêxbezenî

Li gor alimekî îslamî Abbas Gazavî; şêx bezenî li Kirkuk, Erbil, Amur, Akra, û bajarokê Şuvan ê dijîn. Tenê li dorberî Şuvan ê 130 gund in. Seroke wana, Kerim, Omer û Ali bin Tefvik Axa ne. Serokê wana li Koysancaxê Kasim û Şerif Axa ne. Ji heft eşîrên mezin li Aqrê yek jî wana şêxbezenî ne. Gazavî, va heft êlana wekîne bi nav dike; Vazirki, şaylu, şêxbizini, loma, xantabori, şarik û şemzini yan Şemsini. (*Fêrenot; Lî Heymanê di nav federasyonê şêxbezenîyan da jî şavlu hene!*) *Lî gor Gazavî ew hemî bi Mîrîtîya Bahdînan (îmadîye) va girêdayîne.*

Dîsa di kitêba tarixa kurdan Şerefnameyê da qala qaleha Dirdê ya Mîrîtîyên Cezire (nêzikî Dara ye, gunde Tizda-Tizdeh) li Eruh ê derbas dibe û tê da qala şêxbezenîyan dike. Li gor wî ew êlana di vê qalê da dimane; Nuki, Mahmudi, Maksi, Reşikî Mix, Nehran, Peykan, Belan, Balasturan, Şiroyan. Li xencî kurdan, ereb û yêrmanî jî di vê qelê da hebûne.

LE KONFEDERASYONI ŞÊXBİZÊNGELI MINTIQAŶ HEYMANE BIN EŞÎR Û BAWERÎ

	Nawi	Nawê kwêne	Nawê Şêxbizini	Eşîr	Bawerî	Je ku hatiye	Girêdayîye
1	Yenice	Sındiran	Gozgoz	Palanî	Şaffî	Palan/Xanekîn	Haymana
2	Balçıkhisar	_	_	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
3	Pınarbaşı	Baltaliin	_	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
4	Altıpınar	Yenicik	Turin	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
5	Sazağası	_	Saze	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
6	Yukarısebil	Sebilibala	Şawlu	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
7	Yergömu	_	_	Quse	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
8	Yurtbeyli	Köseabdâl	_	Quse	Şaffî - Heneffî	Silêmanîye	Haymana
9	Sinanlı	_	_	Quse	Şaffî - Heneffî	Silêmanîye	Haymana
10	Bostanhöyük		Bostanê	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
11	Yeşilköy	Dikkula	_	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Haymana
12	Canımana	_	_	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Kulu
13	Dipdede	_	_	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Kulu
14	Karacadere	Karakilis	_	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Kulu
15	Dereköy	_	_	Kerkukî	Heneffî	Kerkuk	Haymana
16	Karaömerli	Mandıra	_	Kerkukî	Heneffî	Kerkuk	Haymana
17	Sarıgöl	_	_	Kerkukî	Heneffî	Kerkuk	Haymana
18	Durutlar	_	_	Kerkukî	Heneffî	Kerkuk	Haymana
19	Kayabaşı	_	_	Kerkukî	Heneffî	Kerkuk	Polatlı
20	Yaprakbayır	_	Kelatî	Kelatî	Heneffî	Horasan	Haymana
21	Bahçecik	_	Kelatî	Kelatî	Heneffî	Horasan	Haymana
22	Tabaklı	_	_	Kelatî	Heneffî	Horasan	Haymana
23	Ataköy	Kaltaklı	_	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Haymana
24	Eskikışla	Doğan	_	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Haymana
25	Gültepe	Gedikli	_	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Haymana
26	Aktepe	Alaçık	Xêwend	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Haymana
27	İncirli	_	_	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Haymana
28	Karapınar	_	Lerê Jwêrig	Ler	Heneffî	?	Haymana
29	Evliyafakı	_	Lerê Nawça	Ler	Heneffî	?	Haymana
30	Kavak	_	Lerê Xwarig	Ler	Heneffî	?	Haymana
31	Söğüttepe	_	Xarxur	Jîrîkî	Heneffî	Botan	Haymana
32	Evcî	_	Cîngil	Jîrîkî	Heneffî	Botan	Haymana
33	Gedik	_	_	Jîrîkî	Heneffî	Botan	Haymana
34	Kanlıgöl	_	_	Xêwend	Heneffî	Hemawend	Xirawe/19??
35	Kaleköy	Eski Dereköy		Kelatî	Heneffî	Horasan	Xirawe/1961
36	Soğukkuyu		Bîrê Şêxo	Silênî /Nofelî	Şaffî	Silêmanîye	Kulu

Kaleköy 1900`lü yıllarda dağılmış olup halkı şu anki Kastamonu Araç ve Sinop Boyabat yörelerine yerleşmişlerdir. Kanlıgöl köyü 1960 lı yıllardan sonra kan davası yüzünden dağılmış olup halkı çevre köyler, Haymana ve Polatlıya yerleşmişlerdir.

(Jêrenot; Ji wan êlana Reşî=Reşiki, Belan=Belikî, îro li Anatolîya Navîn hene. Dîsa li bajarî Gergerê navî çemekî Şiro ye û li dorberî va çemî bi piranî gunde canbegan hene.)

Li piştî hilweşandina, belawbûna mîrîtîya Cezîrê şêxbezenî çûne Bahdînanê û ketine bin îdara wana. Yanê birek ji şêxbezenîyan wextekê li Botanê jî mane û îro li Heymanê bi navî Jêrdekan (Jirkî?) gund û êl hene. Dibe ku ew nav ji wê demê mayî bin?

Şerefxan Bîdlîsî nivîsandina kitêba xwe, di sala 1596an da qedandî ye. Li gor wî mîrîtîya Bahdînan 400 sal kevn bûye. Yanê li dor salen 1100-1200î ava bûye. Mîrîtîya Cezîre jî dora 640-650 li piştî fetha îslamiyetê ava bûye.

Şêxbezenî îro li Îranê bajarên Hurremabad û li Siqazê û li Iraqê di nav sinorên Kurdistana Federal da dijîn. Li Bexdadê jî gelek feyli û şêxbezenî hene û piranîya wana zimane xwe jibîr kirine, erebî deng dikin. Feyli û şêxbezenî wek zarave mîna hev in. Ji kurdîya kelxurî û lekîya jorî tîn, bi kurdîya goranî û dimilkî-zazakî va jî nêzikî hev in. Li gor agahdarîyan, şex bezenîyên li başûrê Kurdîstane îro bi piranî kurdîya soranî deng dikin.

Navê çend gundên şêxbezenîyan li dorberî Hewlerê (Erbil)

Kasika, Xorxor (li Heymanê jî gundekî bi vî navî heye), Darmanava jor, Darmanava jêr, Kanîya Süleyman, Berdespi, Bengane, Minare, Cedide, Bincî.

Li gor va agahîyên dîrokî em dikarin zelal û eşkere bibêjin; Şêxbezenî bixwe federasyonêk e û weka êlên din yên ku bi reşî û canbegîyan va tevhev dimeşîyan, yan jî di bin îdara wan da bûn, piştî fermana Osmanîyan ya di salê 1691 da pêşta li derdora Raqqa yê tîn îskan kirin, dû ra yên ku ji wir revyane jî dîsa bi fermaneka din, di sala 1744an da ji bo Anatolîyê hatine şandin. Li berî vê tarixê jî hîn kom ji Raqqa yê revyane û li nav dewleta Osmanî da belaw bûne. Pir kes û malbat ku xwestine ji vê iskanê birevin, heta Qars, Îdir, Erzurum, Behra Reş û birrek ji wan jî li alîyê Behraspî, li dorberî bajarî Adana, Kilikya yê bi cîh bûne, li wa derana mane. Hetanî 1865an da ew jî weke êlên din ya kurdan li Anatolîyê bi darî zorê, mecbûrî îskan bûne û li wa derana gund avakirine.

Ji belgeyên arşîvê em dibînin ku, piştî îskana wana ya mecburî, çûyîn hatina kesan ji bajarên,

sancaxên xwe jî qedexe bûye û tenê bi destûra memûrên dewletê ew mumkun dibûye. Ew jî weka êlên din ji sala 1825an heta 1858an derdiketine zozanên Çerkeşê. Lê dû ra osmanîyan pêşi li vê jî girtine. Me di nav ew qas belgenamayan da tu qala îskan, yan jî bicîhkirina şêxbezenîyan ji hêla Yavuz Sultan Selim da nedîn!

Meriv bi tevahî dizane ku birekî jî kurdan bi rêya Îdrisî Bitlisî alîya osmanîyan girtine û li hemberî farisan, bûne şîrikê dewleta osmanîyan.

Dîsa meriv ji hîn çavkanîyan dizane ku êlen kurdan berê da ji Anatolîyê hetanî Balkan a bi kerîyên xwe çûne û hatine û bi hukumdarên wê demê, rom û Bizansîyan va ji dane û standine! Hîn berî osmanîyan û selçûkîyan jî!

Lê ew ne weka va îskana mezin û dawin bûye. Ew îskana kurd û turkmenan ji hêla osmanîyan da bi zanîtî û li piştî plan û projeyan hatiye bi cihanîn. Pir hindik kes bi dilî xwe hatiye va çola Anatolîyê.

Berî 1691an da dewleta osmanîya bi deh salan li hember serhildanên celalîyan va şer kiriye (Celalî bi pirranî jî kurd û turkmenên elewî pêk hatine).

Li gor fermana, Osmanîyan nehiştine ku bila ew eşîr-êlên kurd li rojava yî Anatolîyê bimînin. Tenê hindik kes yan jî eşîr li wir mane, ew jî vala bela bûne, di nav tirkan da heliyan e. Bûne tirk!

Mezine me digotin; dewletê gotiye gere kurd ji çemî Sequerê (Sakarya Nehri) û Qizilirmakê wêda (Çemîsor) derbas nebin, bo yî vê kurd di nava wan herdû çeman da bi cîwar kirine. Ên ku derbas bûne jî bi tirkan va ketine nav şerên mezin.

Niha em ê ji we ra belgeyên arşivê li gor tarîxa wan yek û yek rêz kin, yên ku tê da bi taybetî îskana mecbûrî ya federasyona şêxbezenîyan tê nivîsandinê, pêşkeş bikin. Orijinála wana ji zimanî Osmanî wergerîye tirkîya nû. Em ê wergera kurdîya wan jî lê zêde bikin. Çewtî û şaşitîya dokumentên tirkîya Osmanî me wekxwe, orijînal hişt.

18.05.975 (1567)

Kıynık'da(İzmir) Husam Fakih adlı şahsı döğen Kulu adlı Kürt ile adı geçenî şer'a davet eden muhzırı döğen Lek Cemaati'nden Kürt Mansur ve suç ortaklarının yakalanarak teftiş olunmaları; suçları sabit olursa hapsedilip durumun arzedilmesi.

Bi kurdî:

Li Bajari Kinik ê kurdeki navî xwe Kuli ye, li Husam Fakih xistîye û hevalbendên wî ji **Cemaata Lekan Kürt Mansur** jî ew ji bo vî karî teşvik kirine. Ew bên girtin û hetanî ku kiryara wan bê ispatkirin di girtîgehê da bimînin û di encama wê da rapor bê dayin.

29.06.981 (1573)

Kayserî'ye tabi Kōsterye köyü civarına konan Kürd taifesinden Lek (?) ve Avanik(cemaatlerinden (Lekvanik) bazıları halkın davalarını çalıp ve başkaca da zarar verdiklerinden şer huzurunda mürafaalarına dair Kayseri beyine ve kadısına hüküm.

Bi kurdî:

Hukum ji bo Begî û Qadî yî Kayserî yê; **kurdên Lekvanik** ku konê xwe li gundî Kösterye ya Kayserî yê vedane, li wir pez dizîne û wekî din jî zîrar û ziyar dane xelkê, di dadgeha Şerîyê da bêne darizandin.

02.01.1136 (1723)

Eşkıyalık yaptıklarından dolayı Kırşehir ve sair mahallerde iskan edilen Lekvanik, Kırtinli, Hacılı, Kızılkoyunlu, Akbaş ve Kusurlu Kürd cemaatlerinin kendi hallerinde olmak ve vergilerini vermek şartıyla Ada-

nadan ifraz olunan Anavarza Mukataasında iskanları.

Bi kurdî:

Ji bo ku ew êlên kurdan weka **lekvanik**, kirtinli, hacilu, kizilkoyunlu, akbas û kurdên kusurluyan eşkiyatî dikirin û li Kirşehîrê iskan bûne, eger ew baca xwe bidin û cardin xerawîyan nekin, icar li Anavarza ya Adana yê iskan bibin.

20.03.1159 (1746)

Adana kazasında vaki Ekrad-ı Lekvanik Mukataası'ndan müfrez Bozalar Cemaati Mukataası reayalarından bazıları yerlerini terk ettiğinden, rüsum-ı raiyyetlerinin kalan kişilere göre tahsil edilmesi.

Bi kurdî:

Ji ber ku hîn kes ji cemaata Bozalar ya **kurdên lekvanik** ku li Adanayê diman, cîhên xwe terikandine, revîyanê, baca wana li gor wê bê hilgirtin.

21.02.1186 (1772)

Lekvanik kürd aşireti perakendesinden Rumeli'de Malkara ve Keşan vesair mahallerde bulunan Keşvanlı cemaati ve tevabii mukataası.

Bi kurdî:

Kirêdayîna/icara birekî ji êlên **kurdên lekvan** li Rumeli yê li

dorberî Malkara
û Keşanê bi Ce-
maata Kehvanli
va girêdayî ye.

Belge 112:
10.02.1198
(1782) 2 Sayfa
İmam Bakir so-
yundan Şeyh be-
zenli ekradından
es Seyyid Molla
Ahmed oğulla-
rının konar göçer
olduklarından
bahisle, koyunla-
rını Ergene de
Kafir dağı deni-
len yerde yayma-
ları hakkında.

Bi kurdî:
2 rûpel.
Ji kurdên

şêxbezeni, nevîyên İmam Bakir
Seyyid Molla Ahmed û zaroyên wî
debara xwe bi pêz dikin û dixwazin
keriyên xwe li çiyayî Kafir-
Ergeneyê biçêrînin. Di derheqa vê
da.

(Jêrenot: İmam Bakir: Newiye Hz.
Hüseyn e, Li gor Şiayan ew kesayeteki
pîroz e û imame 5an e. Navî xweyî



Belge 112: Ji kurdên şêxbezeni, nevîyên İmam Bakir Seyyid Molla
Ahmed û zaroyên wî debara xwe bi pêz dikin û dixwazin keriyên xwe li
çiyayî Kafir-Ergeneyê biçêrînin. Di derheqa vê da. 1198

rasteqîn Muhammed e. 19 sala imamti
kiriye û dûra hatiye kuştin).

25.11.1214 (1799)
Esbkeşan hassî dahilinde sakin Şeyh-
bızanlı Kürdlerinin şekavetinden ve
emvali miriyeyi vermediklerinden şî-
kayet havi tahrirat.

Bi kurdî:

Gilîkirina eşkiyatîya şêxbezenîyên li bajarî Esbkeşanê yên ku emvali Mirîye (Hazine Vergisi) ya xwe jî nadin.

(Jêrenot: Navenda Esbkeşan hassi Cihanbeyli û Koçhisar e û vergîya vira ji Valide Sultan ra dihatiye şandin.)

05.01.1240 (1824)

Ekrad taifesinden Şeyh Bizinli ve Terkanlı ve Cihanbeyli aşayiri Ankara'nın kazalar reayasına ziyan getirdiklerinden tehditleri hakkında ferman suduru babında Ankara ve Kengırı (Çankırı) mutasarrıfının yazdığı kaimeye ait hülasa.

Bi kurdî:

Bi kurdî ferman ji bo valîyî Ankara û Çankırı yê di derheqa bûyerên zirardayîna êlên şêx bezenîyan, têrikan û canbegan a li xelkê dorberî Ankara û bajarokên wê.

Belge 94 - C

BLD_00060_02959_0021 /

Sene 1229 (1813)


Haymanateynli Şeyhbizinli, Mikailli ,Vatmanli, Sinanlilarin Istanbula koyun sevkîyatı

Ma' rûz-ı bendeleridir ki Sâdır olan fermân-ı âlîlerine imtisâlen takdîr ve derkenârında lede'n-nazar Cihan-

beyli mîr aşîreti Alişanzâde Halil Bey kuvvetleri âsitâne-i saadet-i lazîme-siyçün yüz bin kuruş ağnâm sevk ve tisyâr etmek üzere ta 'ahhüd edüp hiçbir sene ta 'ahhüdü mikdarı ağnâm sevk edemediğinden başka ağnâm-ı mezkûrun eskerisi dergâh-ı âlî kapucubaşlarından Pehlivanlı mîr aşîreti Mahmud Bey kuvvetlerinin ber vech-i mâlikâne uhdesinde olan Mikailli ve Atmanlı ve Seyfanlı ve Tirkanlı ile diğêrlînin iştirâken uhdesinde olan Bezenli ekrâd ve aşâyirinin lieclî't-ticâre sevk ve iştirâ eyledikleri ağnâmdan ise de ağnâm-ı mezkûre cümlesi işbu aşâyirin kendi malları olmayarak her millîye(?) merbûtu Pehlivanlı aşîretinden ahz ve iştirâ etmekte idüklerini ve ağnâm sevkine müte'allik tüccarbaşılık bundan akdemce bâ-emr-i âlî Şeyhbizinlu aşîreti boybeyisi Mehmed Bey kulları uhdesinde olarak müte'ahhid olduğu kırk bin re's ağnâmı aşâ'ir-i merkûmdan cem' ve vakit ve zamanıyla Dersaadet'e sevk ve aşâ'ir-i merkûmeyi himâye ve sıyânetle müsterîhu'l-hâl üzere iken mûmâileyh Mehmed Bey'e verilen emr-i âlînin kaydı terkîni ile Alişanzâde Halil Bey kulları bâ-fermân-ı Âlî sevk-i ağnâma me'mûr olup sâlîfû'z-zikr aşâ'ir tüccarlarına müdahale ve

sevk edecekleri ağnâmlarını ahz ve nicelerini tecrîm eylediğinden cümle aşâ'ir ve muhtar Halil Bey'den dilgîr olduklarına binâ'en cümlesi Mahmud Bey'e gidüp eğer ağnâm sevki bundan böyle ke-mâ kân Mehmed Bey kullarına ihale buyrulur ise müte'ahhid olduğu ağnâmı tamamen cümlesini sevk ve irsâl edeceklerini .

Dergâh-ı âli kapucubaşularından Pehlivanlızâde Mahmud Bey kullarından taraf-ı bendegâneme vârid olan tahrîrâtın bir maddenin mefhûmundan Haymaneteyn kazasında sâkin olan Mikaili ve Atmanlı ve Seyfanlı ve Tirkanlı ve Memanlı (Memela) ve Hacıyanlı (Héciban) ve Gerzanlı ve Hocanlı ve Rizganlı (Rişvanlı) ve Mudanlı (Modanlı) ve Emirler (Şêxan) ve Ekecik ve Kesigil (Kesiga- Kesikköprü/ Bala)nâm ekrâd aşâyiri mîr-i mûmâ-ileyhin ve Şeyhbezenli dahi diğerlerinin ber vech-i mâlikâne uhdesinde olup aşâyir-i merkûme öteden beru Dersaadet'e ağnâm sevk ve ticaretiyle me'lûf olduklarından tüccar başlığı bâ-emr-i âli merkûm Şeyhbezenli aşireti boybeyisi Mehmed Bey'in uhdesinde olarak senevî mûmâ-ileyh Mehmed Bey müte'ahhid olduğu kırk bin re's ağnâmı aşâyir-i merkûmeden cem ' ve



Belge 94: Şandına keriyen şêxbezenî, mikailî, vatmanlı? (atmanlı, etmanî) û Sinanlıyan jî Heymanlı? bo Stenbolê.

vakit ve zamanıyla Dersaadet'e sevk ve râyıcıyle furuht ve aşâyir-i merkûmeyi himâyete ve sıyânet üzere iken aşâyir-i sâ'ireden müretteb ağnâmın sevki-ne memur Cihanbeyli mîr aşireti Alişanzâde Halil Bey memur-i sevki olduğu ağnâmı ser-reşte ederek tüccarbaşiyım bi'l-cümle aşâyir benim ta 'ahhüdüme dâhildir ve bâ-emr-i âli memurum deyü sâlifü'l-beyan aşâyir tüccarına müdâhale ve sevk edecekleri ağnâmalarını ahz ve nicelerini tecrîm ile gadra ibtidâr eylediklerinden başka sevk olunan ağnâmın kül-liyetlisi bâ-berât-ı âli mîr aşireti olduğum Haremeyn mülhakâtından Yeniil voyvodalığına merbût Pehlivanlı aşiretinden iştirâ olunup tüccar-ı merkûma Alişanzâde'nin ta 'addîsine tâb âver olmadıkları.

Tarafeyne verilen evâmir kaydları görülmüştür.

Şeyhbezanlı mîr aşireti Hacı İsmailzâde Mehmed Bey'e verilen emr-i âli kaydı mürakkan olmağla bu makûle mürakkan emr-i âli kaydı ihrâcı nice ...sâmîye muhtacdır.

İşbu kayd ...terkîn olunup seksen bin ağnâmdan mâ adâ kırk bin re,s ağnâm dahi irsâl etmek üzere Cihanbeyli aşireti Halil Bey'e hufyeten emr-i şerîf yazılmıştır. Selh-i R sene 39.

Terkîn (Belgenin üstü çizilerek ya-

zılmış yani belge iptal edilmiş)

Şeyhbezanlı mîr aşireti Hacı İsmailzâde Mehmed Bey ve Mikailli ve Atmanlı ve Terikanlı ve Seyfanlı(Seyfikan,Sêfkî, Sêfkan) aşâyiri beylerine ve vüçûh-i aşiret ve söz sahiblerine hüküm ki

Bi kurdî:

Şandina kerîyên şêxbezenî, mikaîli, vatmanlı? (atmanlı, etmanî) û Sinanlıyan ji Heymanê bo Stenbolê.

Di vê belgeyêda Padişah li ser gilîkirina çend êlên kurdan li Anatoliya Navîn, bi taybetî ji li Heymanê lêdipirse, ka mîrî canbegan Halil begê pezê ku soz daye, şandiye Stenbolê yan na û disa dixwaze bizane ka mîrî canbegan wekî tê sûcdar kirin, hîn pez ji bo Izmir, Bursa, Şam û derên din şandiye yan na?

Ya ku me di vê belgeyêda da alaquadar dike ewe ku, qala têkilîyên şêxbezenîyan bi Dewleta Osmanî û bi êlen din va û sistema idarekirina êlan û ya herî girîng jî nave berpirsârên va êlana ne.

Di sala 1813an da qala boybegîyî şêxbezenîya Hacı İsmailzade Mehmet beg tê kirin.Yanê şêxbezenî wêngê di bin îdara boybegekî da ne û ew jî disa girêdayî mîrî êla Pehlivanlıyan Kapucubaşi Mahmud

begê ne. Pirsgirêka li vir şandina pêz ji bo Stenbol ê ye. Li ser şikayeta êlan padişah ji Kapucubaşi Mahmud begê ra dibê bi alikariya qadiyê Heymanê û mixtaran lêbipirse, ka ew rast e yan na.

Wek agahdarî; Kapucubaşi, Kapikulu û Kethuda direkt girêdayî Padişah bûne û bawerîya serayê herî zêde bi wana dihatîye. Di pirs-girekên wekina da hertim îdare didane wana!

Li gor lêpîrsîna Mahmud begê şêxbezenî, mikailî, atmanî, têrikî û sêfikîyên ku di bin kontrola, idara Mahmud Begê dane, para xwe şandine. Tesîra mîrî canbegan ne weka berê mezin bûye. Êlên di bin îdara boybegîyê şêxbezenî Hacı Ismailzade Mehmed begê 40000 mî soz dane.

Bi fermana Sultanî Osmanîyan tucçariya, müteahidiya şandina pêz ya ku berê dabûne boybegî şêxbezenîyan, lê ew dîsa jê hatiye hilgirtin û dane mîrî canbegan Halil begê. Lê belê mîrî canbegan Halil begê peze ku ji wana berhevkeriye neşandiye Stenbolê û diravênwana jî nedaye wan. Êl giştik ji vê dilgiran û aciz bûne. Ji ber wê ew çûne ba Mir Mahmud begê û xwastine ku boybegîyê şêxbezenîya Mehmed

beg tucçariya vî pezî bike, gotine eger ew nabe, ewna cardin pêz nafroşin û dev ji ticareta pêz berdidin. Wana ji Qadi yê Heymanê û mixtarên êlan jî piştgirî hilgirtine. Ji ber şandina pêz û tucçariya pêz di navbera mîrî canbegan û boybegî şêxbezenîyan Mehmet begê da pirsgirêk derketine. Li ser wê hatiye lêpîrsîn ku tesira, quvveta mîrî canbegan ne weka berê li ser êlan pîr e û ew nikarin ewqas pez bişînin Stenbolê. Dîsa li gor gotinên êlên din Halil begê hîn peze xwe şandiye Izmir, Bursa û derên dinê û li wir firotiye, ne weka ku wî sozdaye, li Stenbolê.

Li ser wê biryar hatiye danîn ku ew 100000 pezî hatiye sozdan, 60000î Mehmet Beg û 40000 jî ji hêla Halil begê bê şandin.

Ew lêpîrsin û bûyêrana di sala 1229an da hetani 1231an bû ne.

21.04.1230 (1815)

Cihanbeyli Aşiretinden Alişan Bey'in Haymanateyn kazası sakinlerinden Şeyhbızınlı Aşiretinden bazı kimselere tecavüzü.

Bi kurdî:

Êriş û tecavûza êla canbegan Alişan Begê li ser hîn kesên ji êla şêxbezenîyên li Heymanê.

21.01.1237 (1821)

Ankara sancağındaki Şeyhbızınli Aşireti ile Konya sancağındaki Cihanbeyli aşireti Kürtleri eşkiyasının magsubatına ye badema mezkur aşiretlerden herhangi birinden mal gasbı, nüfus katli gibi bir hal zuhur ederse o aşiret tarafından Devlet-i Aliye'ye bin kese nezir akçesi verilmesi beyleriyle kararlaştırıldığına dair Ankara mütesellim ve kadısına yazılan hüküm.

Bi kurdî:

Biryara hukma Sancax beg û Qadi yê Ankara yê; Eger ji êlên şêxbezenîyên li Ankara û eşkiyayên canbegên Konyayê dizîya xelkê bikin, yan jî bikujin, her eşiretek mecburê 1000 akçe bidin devleta Osmanî. Ew pêyman bi mîrên wana va hatiye çêkirin.

05.01.1240 (1824)

Ekrad taifesinden Şeyh Bızınli, Türkanli (Terkanlı) ve Cihanbeyli aşayiri Ankara'nın kazalar reayasina ziyan getirdiklerinden tehditleri hakkında ferman şuduru babında Ankara ve Kengiri (Çankırı) mutasarrıfının yazdığı kaimeye ait hulasa.

Bi kurdî:

Nivîsa, fermana sancaxa Ankara û Kengiri (Çankiri) yê di derheqa zi-

rar û ziyana ku kurdên şêxbezenî, canbegî û têrikîyan dane xelkê qazayê Ankara yê.

25.07.1249 (1833)

Tirikanli ve Şeyh Bezenli aşiretleri arasında katl ve yağmadan mütevellid nizain mahallinde halli için yapılan teşebbüsten, Tirkanlı Aşireti'nin Rısvan Aşiretince korunması ve katilin Gümüşgan Maden Emiri Abdurrahman Bey tarafından himaye edilmesinden müsbet bir netice alınmadığına dair.

Bi kurdî:


Ji bo teşebbusa halkirina şera navbera êlên têrikan û şêxbezenîyan da, ya ku tê da kuştin, dizî û talan jî bûye, êla têrikan ji hêla êla rêşîyan û mirî Gümüşgan Madenê Abdurrahman Beg va hatine parastin û ji ber vê ew pirsgirêk bi erênî çareser nebû ye.

29.12.1258 (1842)

İskilib, Osmancık, Tosya kazalarına iskan edilen Şeyhbızınli, Çakallı, Cihanbeyli ve Rısvanlı aşiretlerinin kibtileride dahil tahrir olunan isim ve nüfuslarının havi aşairin tahrir-i nüfus defteri.

Bi kurdî:

Deftera Tahrir ya ku têda nav û hêjmara kesên ku ji êlên şêx bezenî,



ML.VRD.TMT.d.03463

Belge: 104: Qeyda şexbeziyên li Düzceyê hatine îskankirinê.

çakalli, canbegî, rêşî û gewendeyan
jî te dane û li Îskilib, Osmançık û
qaza Tosya yê hatine îskan kirin.

Belge 104: 1261 (1845), 8 Sayfa
*Düzce'de iskan edilen Şeyh Bezen-
lilerin kayıtları.*

Bi kurdî:

8 rûpel: Qeyda şêxbezenîyên li Düzceyê hatine îskankirinê.

**Belge 119, I-DH-00116-5844/
Sene 1262.**

Mikaili ve Şeyhbezenlilerin Ağnam (koyunbedelleri, Cihanbeyli Aşiretinin Müdürü Alişan beyin borcunuz var diyerek el koyduğu koyun paraları ile ilgili şikayetleri,


Bi kurdi:

Berdela heyvanên (baca pêz) şêxbezenî û mikailîyan.

Di vir da êla şêxbezenîyan gîlî û gazincên xwe ji padîşah ra dikin. Her çiqas serokî qeseban û kethudayî berpirsyar ji bo 61 rojan senedek dayî wana jî, perêyen pezî wana ku ji bo Stenbolê hatiye şandin, nedane wana û li şûna deynî mîrî canbegan Alişan bege hatiye hesabandin. Ewna jî dibêjin tu elaqaya wan bi mîrî canbegan va tunne ye û nedayîna pereyî pezî wana neheqîyeke.

Bi tirkîya Osmanî:

Hak sübhânehû ve ta 'âlâ hazretleri Mübarek mu'allâ rikâb-ı kamer tâb-ı şahaneye arz-ı hal-i celeb fukara kullarıdır ki sâye-i mülûkânede beher sene yetim malı olarak ve sâ'ir düyûn



Belge 119: Berdela heyvanên (baca pêz) şêxbezenî û mikailîyan. S. 1- 1262

ile ahz edüp 'Dersaadet'e getürmüüş olduklarımız ağnâmın akçe vademiz tamamında derdest edüğ mahall-i âcizânelerimize gitmekte isek de bu sene-i mübârekeke 'Dersaadet'e getürmüüş olduklarımız ağnâmlarımızın akçelerini altmış bir günde tamamen yedlerimize te'diye eylemeleriyçün kasab başı kullarıyla ve kethüdâsı kulları sened vermiş ise de senedimiz tamamında meblağ-ı mezkûrlarımızı matlûb eylediklerimizde Alişan Bey kullarının düyûnuna mahsûb olunmasına irade-i şahane var deyü kasab başı ve kethüdâsı kulları cevab vermişler olduklarından kullarına külliyyen gadr mücib bir keyfiyet olup ancak Alişan Bey'e habbe-i vâhîde düyûnlarımız olmayup ve hem aşiretinden olmadığımız ma'lûm-i mülûkâneleri erzân buyuruldukda merâhim-i eltâf-ı şahanelerinden

mercüvdür ki Allah aşkına ve hazret-i peygamber aşkına ve mübarek ser saadet efsar-i şahaneleriyçün hal-i bendegânelerimize merhameten matlûbât-ı bendegânelerimizi yed-i çâkerânelerimize te'diyesi hususuna emr-i irade-i şahaneleriyile cümlemizi çerâğ ve ihyâ buyurmaları niyazlarımız bâbında ol bâbda emir ve irade efendimiz hazretlerininindir.

Bende Şeyhbezenli aşâ'ir fukarâları kulları.

07.1263 (1847)

Ekrad taifesinden ve Şih Bızınlı Aşiretinden 69 hanenin Izmid'de iskan edilecekleri.

Bi kurdî:

Ji êla kurdên Şêx Bezenîyan 69 malbat li Izmidê bêne îskan kirin, bişûn kirin.

27.11.1263 (1847)

Harpût eyaletine bağı, Çermik, Ergani ve Siverek kazalarındaki Şeyh Bezenli, ve İzoli Aşiretlerinin maktuan Diyarbakırlı Kâşım Ağâ'ya tahsis kılındığı (8. Anadolu)

Bi kurdî:

Çermik, Erxenî û Siverek ku bi ser Eyaleta Xarpit'ê va ne, ji bo Kasım Axayî Diyarbekrê hatine tahsis kirin, dayin.

(Jêrenot: Ew bûyêr li piştî îskana kurdan ya li Anatolîya Nêvin bû ye, yanê paşmayîyên îskana ne.)

Belge 10: 12.10.1267 (1851)

A_MKT_MHM_00755_00008_001_001-
Ankaradaki Cihanbeyli, Atmanli, Mikaili, Şeyhbezenli, Emirler, Keykilli, Ziveli aşiretleri ile Tabanlı kazasının adet-i ağnam rüsumunun adı geçen aşiretlerin kaymakamı Rıza beye ihalesi.

Bi kurdî:

Dayîna îhaleya baca pêz ya êlên li Ankara;ji bo qaymaqamî canbeg, etmanî, mikailî, şêxbezenî, emirler (şêxika), keykilli, kiveli û qazayê Tabanlıyê, Rıza Beg ê.

Belge 84-85 - 1268(1852)

Amasya ve Çorumda iskan edilmiş kürt aşiretleri

Bi kurdî: Îskana êlên kurdan li bajarên Amasya û Çorum ê.

Belge A/MKTDV/ 15.11.1278 (1862)

Taleb eden Emin Efendi'nin Sapanca köyü Uzunyayla'da ikamet eden Şeyh bezenli aşireti'den tacir Satılmış hacı Ahmet adlı şahıstan alacağı'nın tahsili.

Bi kurdî:

Hilgirtina deynî ji taleba Emîn efendî ji êlên şex bezenîyan bezîrgan Satılmış Hacı Ahmet li gundî Uzunyayla-Sapanca yê.

1278 (1862)

Bolu'nun Düzce Kazasında haymenişin Ekrađ taifesinden İsmail Bey, hizmetkarı Kürđ Mustafa ve refiki Abdi ile kardeşi Kışı Ahmed adlı şahısların Düzce'de haymenişin H. Yusuf oğlu Mehmed'in eşi Zeliha'yı dağa götürmüş olduklarından istintakları.

Bi kurdî:

Ji ber ku ji kurdên li Bolu - Düzce rûdinin, paqij- xizmetkar ê İsmail Beg ê kurd Mistafa û birayê wî Abdi û Kisi Ahmed ji şênîyên Düzce yê jina Hacı Yusuf oğlu Mehmed revandinê û rakirine çîyê, bêne dari-zandin.

09.12.1300 (1882)

Ankara'da kışlamakta olan Portek, Cihanbeyli, Şeyh bezenli, Karali, ve Sermayeli aşiretlerinin aşiret beyleri maiyyetine tayin olunacak kişilerin bir an evvel gelmeleri için sancak mütesellimleriyle aşiret beylerine ve saireye hitaben emirlerin işdari.

Bi kurdî:

Ji bo kesên maiyeta beg û mîran hatine tayin kirinê gaveka zûtirin warin, emirname ya ji bo sancax begî, mir û begên êlên ku zivistana li Ankarayê derbas dikin, weka portek, canbeg, şêx bezenli, karali û sermayeli.

Belge 114: 1320 (1904), 4 Sayfa

Şeyh Bezenli nahiye müdürü (Sindirani, şimdiki adı Yenice) İshak Lütfü Efendinin azlî yerine Ali Rıza efendinin tayini.

Bi kurdî:

4 Rûpel: Ji kar dûrxistina mudirî nahiyê ya Şêx Bezenli İshak begê û li şûna wî tayina Ali Rıza begê.

Orijînala Belgayan:

Belge No: 112, Belge No: 94, Belge No: 104, Belge No: 119, Belge No: 10, Belge No: 85, Belge No: 114,

Çavkanî:

- 1- T.C.Arşivler Genel Müdürlüğü Osmanlıca Bölümü
- 2- Şerefname-Serefxan Bidlîsi
- 3- Geçmiş ile Buluşan Haymana- Enver Yurttaş
- 4- Dîroka Kurd û Kurdistanê - Mehmed Emin Zeki Beg
- 5- Abbas Gazavi, Tarixzan/Iraq

Hevpeyvînek bi derhêner Samî Mermer ra

Adem Özgür

rojnameger, ozguradem25@gmail.com

Di van salên dawî da di sinemaya kurdî da bêdenîyeke mezin heye. Bi taybetî li bakurê Kurdistanê û li rojhilata Kurdistanê derhênerên kurd gelek filmên girîng kişandin; lê niha filmên nû tunene.

Li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê li ser sînemaya kurdî nîqaşên baş dihên kirin û kitêbên nû çap dibin. Li gor van nîqaş û kitêban, sînemaya kurdî her çiqas di bin zordarîya dewletên dagirker da be jî heta niha xebatên baş hatin kirin.

Bi ya min, wekî min di destpêkê da jî got, kêmasîyeke mezin heye ku êdî em di van salên dawî da nikarin rasterast qala sînemayeke kurdî bikin.

Bêdewletbûna kurdan nahêle ku endustriyek sînemayê ava bibe. Ji ber vê yekê ancax bi destûra dewletên cîran, kurd filman dikîştin an jî bi piştgirîya dewletên bîyanî, yanê li surgûnê film amade dibin.

Yilmaz Guney ji bo vê yekê mînakek baş e. Guney li Tirkîyê yekem derhêner bû ku di derbarê

kurdan da filmên “sîyasî” kişand û kurd wekî miletekî bindest dida nîşandan. Ji ber vê yekê filmên wî yên *Rê (Yol)*, *Kerî (Sürü)*, *Dûwar (Duvar)* wek filmên ekol dihên qebûl kirin.

Filma wî ya *Rê*, xelata *Zêrîn Ya Palmiye* ya fransî stendiye. Fîlm di wê demê de ji alîye desthilatdarîya Tirkîyê ve hatibû qedexekirin, çimkî film qala pîrsgirêka kurdan û pîrsgirêka ku rewşa tirkî tê da bû dikir.

Li rojhilata Kurdistanê derhênerê navdar Behmen Qubadî jî, bi filma xwe ya sala 2000an *Dema hespên serxweş* li Festîvala filman a Cannasê xelata bi prestîj *Camera d’Or* wergirt. Piştî vê xelatê gelek derhênerên kurd ji Behmen Qubadî feyz girtin.

Piraniya filmên kurdî bi piştgirîya welatên biyanî dihatin amadekirin û ew wekî finansmanê wan bûn. Hê jî filmên ku di derbarê kurdan û proseya Kurdistanê da çêdibin li welatên biyanî dihên amadekirin.

Fîlma Xalko

Yek ji wan filman jî *Xalko* ye. Belgefîlma *Xalko*, di 7. *Festîvala Nêvneteweyî ya Fîlman a Dihokê* da di nava filmên fiktîf ên metraj dirêj de, bû filma herî serketî û xelata Pela Zêrîn wergirt. Fîlma *Xalko*, qala pirsgerika koçberî û tenêbûna jinên kurd dike. Di film da pîrsa jinan dihê zimên û mijara zewaca malbatê jî baş dihê nîşandan.

Li gor nerîna min, pirsgerika jinên kurd û koçkirina bo dewletên bîyanî tenê bi îktîsadî nabe; lewra ev mesele tiştêkî zayendî, derûnî û dîrokî ye jî. Ji ber vê yekê Samî Mermer, qala mijarek gelek balkêş dike.

“Çîroka deh hezar salan”

Li gor Samî Mermerî, çîroka belgefîlmê, çîroka bindestîya kurdan e ku deh hezar sal in berdewam e: “Çîroka belgefîlma *Xalko*, çîrokeke deh hezar sal in diajo. deh hezar sal in kurd bindest û koçber in. Koçberîya me qet bi dawî nebû; kurd hê jî ji malên xwe dihên derxistin.”

Samî Mermer qala film dike û dibêje, “Ez kurd im û jîyana kurdan di sînemayê da didim nîşandan. Ji ber ku ez diherim kîjan welatî, min ne wek kurdekî Anatolîyê, kurdekî ji Kurdistanê dibînin.”

Pirsgerikên jinên kurd

Em di rojnamegerîyê an jî di karê sînemayê da jî dizanin ku wek miletê kurd, zehmet e ku qala jinan bikî. Samî Mermer jî ev zehmetîya kişandîye ku hê jê ra dibêjin “divê me jî film derbixî.”

Li gor Mermer, divê jin zêdetir derkevin pêş kamerayê û qala xwe bikin:

“Li ser meseleya jinan kişandina filman tiştêkî gelek zor û zehmet e. Di ser film ra çend meh derbas bûn hê jî di navbera min û jinên ku di belgefîlmê da cîh girtin da problem derdikevin. Piştî festîvala Dihokê film hate naskirin û piranîya wan ji min ra peyama şandin û digotin ‘xwaska te em dernexistana.’”

Ji ber van gotinên jinan û mêtên wan, Mermer çend dîmen ji film derxistîye.

Tiştêkî din jî dibêje ku bi ya min pirsgerika di navbera mêt û jinan da jî ev e: “Mêr çûn welatên din û jin bi tenê hîştin. Jin wek leşkeran dihatin hesibandin û ew bi pêş neketin.”

Samî Mermer qala kurdên Anatolîyê jî kir û got: “Divê kurdên me pir mêla xwe bidin sînema, çand û hunerê. Potansiyela me heye, em dikarin pir tiştan bikin û netirsîn;

fedî nekin. Her tişt dihê kişandin û ez ê ji wan ra bibim alîkar.”

Festîvala Dihokê

Mermer qala 7. Festîvala Navneteweyî ya Fîlman a Dihokê jî kir û li gor wî pir kesan bala xwe da Xalko û kurdên Anatolîyê.

Mermer, serpihatîya xwe ya Dihokê veng anî zimên:

“Ji çar parçeyê Kurdistanê û ji welatên biyanî gelek derhêner û sînamegerên kurd çûbûn başurê Kurdistanê, festîvala Dihokê. Ez ji ber vê yekê pir şa bûm, çimkî min li wir gelek fîlm dîtî û min pir kes nas kirin. Wan ji fîlm pir hez kirin, serkeftî dîtî. Hin kesên ku kurdên Anatolîyê nas nedikirin hebûn, min ji wan ra qala me kir û me bi hev ra li ser kurdên Anatolîyê deng kir.”



Afişê filmê Xalko

Samî Mermer da zanîn ku ew ê di demeke nêz da bi projeyên nû derkeve pêş û wê zêdetir qala çand, dîrok û nasnameya xwe bike.



Dîmenek ji filmê Xalko



Samî Mermer

Samî Mermer li gundê Qulto (Sağlık) ji dayik bûye. Gundê wî girêdayê Cihanbeyliya Konyayê ye. Salekê li zanîngeha Selçûkê, salekê li Ankarayê xwend bi şunda li Zanîngeha Stenbolê dest bi beşa endezyariya hawirdorê kir. Dema li Stenbolê dixwand di Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) da dersên sînemayê dît. Li wê derê dest bi kare sînemayê kir.

Di sala 2000î da ji Stenbolê çû Kanadayê. Li wir di zanîngehekê da dersên zimên û sînemayê dît. Lê di sala 2003an da ji wî welatî hate derxistin û ew çû Amerîkayê;

li wir yekemîn filma xwe ya dirêj kişand. Filma *The Box of Lanzo* di sala 2006an da hate kişandin û film qala kesên bêmal dike.

Film û belgefilmên Samî Mermer di gelek festîvalên navnetewî da xelat girtin.

Samî Mermer bi jineka Fasê ra zewicîye û du kurikên wî hene.

Fîlmên Samî Mermer

Xalko (2018)

Callshop Istanbul (2015)

Carol Wainio (2014)

Le Semeur (2013)

The Extra (2011)

Taxi Casablanca (2010)

III Victoria (2008)

The Box of Lanzo (2006)

Bîranînên Fikret Çeşmeli


Rohat Alakom



Bergê pirtûka
Fikret Çeşmeli

Di sala 2015an de bîranînên hurnermendê şano û mûzîkê Fikret Çeşmeli ku ji alîyê bavê de kurd e bi zimanê swêdî bi sernivîsa “Berfa bipêt û barana ziwa-Di navbera du çandan de” der çûne. Bavê wî Muharrem di sala 1966an de tê Swêdê, wê demê Fikret zarokêkî sêsalî bûye. Bîranînên Fikret Çeşmeli bi koçberîya bavê wî ya ber bi Swêdê dest pê dike. Ew û sê hevalên xwe di sala 1966an de berê xwe didin Swêdê bona li wir kar bikin û piştî demekê şunda vegerin. Lê belê

çawa em dibînin wisa naqewime, heta niha jî malbat li Swêdê dimîne. Kalikê Fikret (bavê bavê wî) di sala 1924an de ji alîyê Agirîyê (Ararat) bi peyatî li gel kerê xwe tê derdikeve Anatolîya Navîn. Navê wî Mehmed bûye, carina jî ew bi navê dayîka xwe hatiye nasîn, jê re gotine “Mehmedê Kevey”. Di nav kurdan de edetek e dema dayîka yekî bi qencî û pakîya xwe navdar dibe, gelek caran zarokên malê bi navê wê tên nasîn. Mirov di pirtûkê de dibîne ku Fikret gelek ji kalikê xwe



Kalikê Fikret ku di sala 1924an de ji Agirîyê koçberî Anatolîya Navîn kiriye (li milê rastê)
Kesê li kêleka wî bavê Fikret, Muharrem e û zarokê li paş wan jî birayê mezin yê Fikret e.

hez kiriye. Kurdên Anatolîyê ji deverên wek Adiyamanê, yên din ji deverên wek Qers û Qerekosê hatine Anatolîyê. Wek mînak hunermend Fikret Çeşmeli di cîhekî din de dibêje ku kalikê wî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem di salên 1920î de bilûra wî di dêst de wek şivanekî ji Agirîyê (Qerekosê) hatiye li Anatolîya Navîn cîwar bûye.

Fikret Çeşmeli di sala 1975an de dema çardehsalî bûye hatiye Swêdê. Heta niha jî ew li Swêdê dimîne. Ev bi qasî 45 sal in ku li Swêdê dijî, wek şanoger û muzîsyen hatiye nasîn. Di çend filman de jî listîye. Lêkoler Anders Hammarlund xebata xwe ya doktorayê li ser hunermendîya wî amade kiriye, paşê ev xebat wek pirtûk hatiye weşandin. Berî panzdeh salan dema min di derbarê

dîroka Kurdên Swêdê de kar dikir û dixwast dîroka wan derbasî ser kaxizê bikim gelek kesayetîyên ji Anatolîya Navîn bala min kişandin. Yek ji wan jî Fikret Çeşmeli bû. Di lêkolîneke xwe de min bi kurtî qala wî kiribû.

Piranîya kurdên ji Anatolîya Navîn ku koçberî Swêdê kirine bi karê pîzeyê mijûl dibin. Her derê Swêdê mirov dikare rastî pîzexaneyên kurdan bê. Navên wan wisa belav bûye êdî tê gotin û niqaşkirin wekî çêkirina pîzeyê îcateke kurdan be. Ev yeka bûye mijara sernivîseke dîroknasê swêdî yê navdar Dick Harrison jî. Kurdên Anatolîya Navîn gelek caran Swêdê wek welatê xwe yê sêyem dibînin. Rasthatin û hevdudîtina çend kurdên ji Anatolîya Navîn li ser erdê Swêdê bûye mijara beşeke pirtûka Fikret Çeşmeli jî. Bona jiyana kurdên

Anatolîyê li Swêdê ev beş bi gelek alîyan ve balkêş e. Mirov li jêr di vê beşa pirtûkê ya bi navê “Pîzexaneya Tommy” de dibîne ku kurdbûnê ew ber bi xwe ve kişandiye. Van kurdan ji nû ve nasîya xwe li serê dinyayê, li ser erdê Swêdê, li bajarê Falkenbergê dane hev.

“Pîzexaneya Tommy”

Rojeke xweş ya payîzê bû li Falkenbergê. Ez li gel Şanoya Dewletê derketibûm turneyê. Êvarê me dê şanoya Hamlet bilîsta. Min dev ji taştê berda û derketim seyranê li derdorê vî bajarê piçûk. Li wir çemek hebû. Li herdu aliyên çem rêyeke gerê cih girtibû ku di nav dar û devîyan de dirêj dibû. Dema pêlên avê li keviran diketin bi tonên cihê tinginê jê dihatin. Belgên zerîn hêdika ber bi çem diweşîyan û melodîya avê dişopandin. Serê her sî metroyî cihêkî masîvanek bi kincên avê û bi cîzmeyên lastîk di nav çem de bûn. Tek tuk mirov li vir û wir li ser rûniştgehan hebûn. Piştî gereke dirêj ez gihîştim navenda bajêr. Dilê min xwest ez pîzeyekê wek navroj (firavîn) bixwim.

“Bibore, li vir pîzexaneyek heye gelo? min ji kalekî pirsî.

“Erê, heye” wî got û rê nîşanî min da.

Avahîya pîzexaneyê dişibande vilayeke normal. Bi rengê aravî (pembe) hatibû boyaxkirin. Jora dêrî lewhayek hebû û li ser lewhayê navê “Pîzexaneya Tommy” hebû. Li wir di hundir de du kesên porreş kar dikirin. Yek ji wan bi tementir bû û simbêleke wî ya reş, wek firça şekirî, gelek mezin hebû. Yê din bê rû bû. Bêyî ku li menuya (lîsteya xwarinan) li dîwêr dardakirî mêze bikim min pîzeyê xwe ya berdilk xwest:

“Merheba, yek Marinara, spas”

“Tu ê li vir bixwî?” kesê bi simbêl pirsî.

“Erê. Spas. Wekî din jî ez wê gelek baş pijiyayî dixwazim, spas”.

“Elbet elbet. Kêr û çetelan, vexwarinê tu bi xwe dikarî hildî. Çil kron, spas”.

Min dêvla pereyan kupongên dewletê danê. “Spas! spas!”

Piştî çend deqeyan kesê bê simbêl bi pîzeyê ber bi maseya min hat.

“Noşîcan be. Tu ne ji Falkenbergê yî, ne?”

“Na” min bersîva wî dayê. “Ez ji Stockholmê me, lê belê di eslê xwe de ez ji Tirkiyê me. Û hûn ji kîderê ne?” paşê min pirsî.

“Kurdistanê” herdu kesan bi hev-ra gotin.

“Ji kîjan Kurdistanê?” min pirsî.

Wê hingê min dît ku hêrsa wan hat,
bi lez min got:

“Ez dixwazim bêjim ji kîjan beşê
Kurdistanê?”

“Tenê Kurdistanek heye” kesê bi
simbêla mezin bi sert got. Dema qala
Kurdistanê kir simbêla wî lerizî.

Kesê bêsimbêl paşê wiha da zanîn:
“Ez ji Kurdistanê Tirkiyê me û ew jî
ji Kurdistanê Iraqê ye”. “Û tu ji kî-
jan beşê Tirkiyê yî?”

“Ez ji Anatolîya Navîn têm, ji
Qonyayê” min bersîv da.

Kesê bi simbêl dema guh dida me
bi pankirirna hevîrê pîzeyê ve mijûl
dibû. Kesê bê rû zîq li çavên min
dinêrî.

Paşê wî got: “Ez jî ji Qonyayê têm”

“Na lo, lê, te berî gavekê negot tu
ji... “

Wî gotinên min qut kirin:

“Ez ji Beşkavakê me”

“Erê, ew gundê kurdan e. Ez li
Kozanliyê hatime dinê ku nêzî gundê
te dimîne“, min got.

Wî dest pê kir bi tirkî bi min re
peyivî.

Kuzena min bi kesekî ji gundê
Kozanliyê re zewiciye. Navê wê
Meneşe ye. Navê bavê wê Mistefa
bû û birayekî wê hebû ku navê wî
Musa bû. Meneşe ji kanserê mir.

Serê min bi temamî gêj bû.

”Çi? Raweste, raweste. Tu çi
dibêjî? Meneşe kuzena min bû. Ke-
sa ku tu li ser dipeyivî keçxala min e”
min got. “Û birayê wê Musa yek ji
wan hevalê min yên zarokatîyê ye”.

Demekê em bêdeng man. Kesê bi
simbêl qawe ji me re anî.

“Tu şekir û şîr dixwazî?” wî pirsî.

”Tenê şekir, spas!”

”Em hema hema xisim in” kesê
bêsimbêl got.

”Belê hemû Anatolî xizmên hev
in” min got.

”Ji Musa re silavan bêje, navê min
Osman e. Ez kurê Hesênê rûspî me ku
dikaneke wî li wî gundî hebû”.

”Erê, ez ê bêjimê. Musa jî wek
pîzacî di loqenteya birayên min de
li Stockholmê kar dike. Xweş bû me
hev nas kir. Û spas bona qaweyê.
Navê min Fikret e. Kalikê min jî
kurd bû” min got û jê re vegot ku ew
li Kozanliyê jîyaye.

Osman tam zanibû ew kî ye.
Bavê wî hatibû defnkirina kalikê
min dema ew di sala 1979an de çû
rehmetê. Min ew vexwandin şanoyê.
Wan spasî vê vexwandinê kirin, lê-
belê bona wan wextê hatina şanoyê
tune bû, dê berdeyam bikirina pîze
bipetana.

Colo pišta xwe da çiya, berê xwe da Girî Qoce, kete rê. Ew ê biçûya ba Husîn, destbirakê xwe. Wî û Husîn bi salan tevûhev pez çêrandî bûn. Ji Newala Mirckê bigre, heta Mezelê Gawira, ji wir bigre heta Newalê Pîrkê, Zozana Mala Mih topicalê û ya Alî Axa. Tevûhev pez mexel û şevîn kirî û di bin yek kilavî de raketibûn. Husîn çiqas şivanekê baş bû, Colo ewqas jênehatî û tûr bû, Husîn çiqas bêdeng û kamil bû, Colo ewqas devsist û devgerm bû. Du kesên ku ji serî heta binî ji hev cûda bûn. Lê Husîn dîsa jî ji Colo hez dikir û her tim destî xwe di ser ra digirt, di qisûra wî nedima. Hemhema hemsalê hev bûn, lê Husîn ji bo Colo wekî bav, wekî birayekî bû. Colo bavê xwe nedîtibû, yan jî nedihate bîra wi -gava ew hê biçûk bû, li ber qamyoneke ku ceh û genim dikişande qezayê ketibû û di cîh de ruh jê vekişiyabû. Dayîka Colo gava ew bûbû pênc salî, bêyî dilî wê, bi zora dê û dota, dabûbûn mêrekî ji wê mestir. Colo û xwanga wî ya ku sê sala ji wî mestir, Melek, li mala kalkê xwe mabûn. Kalik û pîrik, xal û apên wan destên xwe di ser wan ra

digirtin, lê navê sêwitîyê giran mina konekî reş xwe avêtibû ser bextê wan. Colo û Melekê çî dîtibûn, çî nedîtibûn, tişt nemabû ku nehatibe serê wan. Sewitî, xizantî, bêxwedanî. Mesela wan dirêj e. Em ê dîsa vegerin ser serpêhatîyên wan yê zaroktîyê. Lê em niha vegerin ser mesela Colo ya dawîyê.

Ne wekî berê be jî, hê tirs di dilî Colo de hebû, westîya bû jî. “Ka ez bîstekê mexelêm” berî rûniştinê go û gotina wî bi wî jî xweş hat, kenek bi lêvên wî ket. “Yek tereke mexel tê û yek jî ez. Ne tereke bûma îşê min li vir çî ye?” di ber xwe de kire piltepilt.

Colo rêya xwe bi nivî kirîbû. Gom û hewş û tereke jê ve xûya dikirin. Destê xwe da cênîga xwe, xwîna wî zûha bûbû. Çavên wî daketin ser şalê wî. Şûna mîzê ji navranê heta derlinga bûbû lekeyeke mezin. Ji ber xwe fedî kir. Ewê bi vî halî xwe çing biçûya ba Husîn. Husîn ne lê, jin û zaroyên Husîn wê bi wî bikenîyana, cîran û heval jî bi ser de. Ev yeka wê jê re bibûya serhevde. Mirovên Girî Qoce ji henekan û serhevdan hez

dikirin. Îro nebe jî, sibê herkes ê bi halê wî bihesîya. “Kelmîz, Coloyê kelmîz.” Colo-Qolo, Qenare, Kirto ne bes bûn, bi ser da jî “kelmîz”. Na, nabe ku ew bi vî halî here ba destbirakê xwe. Da ku kes wî bi vî halî nebîne, ew ê berê di ser ocaxê gilê re biçûya ser çem, li wir şalê xwe bişo û avekê li serçavên xwe bike. Wî weng jî kir. Dûr û dirêj, wekî ku kes wî nebîne, di ser ocaxê gilê re xwe avête qerexa çem. Şalê xwe derxist, zû zû avek lê kir û avêt ser bilçikên dara biyê, dest û serçavên xwe şuşt û xwe li ser piştê avête ser hêşînayê.

Bîstekê bi xew ra çûbû Colo. Bi dengê Hesî Oskê, ku sê-çar salan ji wî mestir bû, bi xwe hesîya. Qet ji Hesê hez nedikir -şorên Hesê yê giran bûn û tim qirfên xwe bi wî dikir. Hes li ser nîngan bû, him deng dikir, him jî dikenî.

- Coloyî min Qolo tu çir dikî, bi vê qûna nîvtazî çî rixê li vir belaw dikî? An na şalê te yî tenê ji te dizîn?

„Mimagayî mîna neyisiza, tu dibêjî çî dîsa? Mar ji pûnge hez nake, pûng jî li ber pozî mêr diruze.“ Colo bi hêrs li Hesê vegerand. Hesê çoyê di desta du cara di herdê kuta „Colo, Qolo, Qûntazî“ got û kire

hîkehîk û berê xwe da Girî Qoce.

Piştî ku Hes çû bi şûn da, Colo rabû, şalê xwe yî nîvşil li xwe kir, destê xwe di ava çem da kir, di serçav û porê xwe da û kete pê Hesê.

Hes li pêş, Colo li paş bi lez ketin nav malan. Serê Hesê mîna vijika çerx di bû -teyê bigota qey li kesekî digere yan jî tiştêkî xwe wenda kiriye. „Di serî mîna boxê hukmatê de hatiyo. Şor tê de danaste, şaş bûye ji kê re qalê bike.“ Colo şora xwe li Hesê xist. Hesê gotina Colo di xwe negîhand, di koşê xaniyê mala Omke re şikand ber ve jor çû. Colo jî berê xwe da mala Husîn.

Di ber goma Husîn re derbas bû, kes tûnebû. Dengê tereke ji hundir dihat, lê derî girtî bû. Ji wir da her du kurên Husîn dîtîn, ji xwe re li ber malê dilîstin. Colo bi dengêkî bilind „Oleow, Kamo, Husîn î li mal e?“ got û hê şora xwe xilas nekirîbû Husîn ji kêleka malê derket û berve wî hat. Bikêfbûyîna Husîn di dengê wî ra dîyar bû. Bi dengê xwe yî nermik, go „Destbirakê min î hatîye“ û berve wî çû, xêrhatina lê kir û go „Lê lê Eşê Coloyê destbirakê min î hatîye. Berê çayekê bi serde, paşê jî berxekî şerjêke!“ Eş ji aşxanê bi rûyekî derket, ê bi kêf bû. Wê destên xwe yê şil bi bervanka



Gire Qoce, ji alîyê gir ve, Foto: Faruk Demirsoy

xwe zûha kir û go „Husînê birangê min î hatîye. Weee Husîn, tu berxekê layiqî birangî min dibîni? Berxek nê lê deh beran ji birangê min ra bi qurban. Lê di Girî Qoce da yekî bi nimê û abdest tune ku ji me ra şerjêke. Loma jî ma birangî di qisûrê min nemîne û bi bulxur zikî xwe têr bike.“ Hikahîka wê bû dikeniya. Husîn ne, lê Colo jî dest bi ken kiribû. „Çayî hazir e, nan jî min daye ser. Hûn herin rûnin ez sifre daynîm. „Eşê go û kete aşxanê. Husîn î destfireh bû. Di dest da hebûya, ewqasî ku ji destê wî were, wê li dost û hevala jî belav bikira. Lê wê êvarê berx nehate şerjêkirin û qala wê jî nebû. Eşê, Colo jê ra digot Eysanê, bulxurê bi nîsk çêkiribû. Bilxur li ser naneke sêle kirî û rûn di ser ra gerandibû. Li kêlekê çeqelmaşt, pîzavên sor û çend guşî tirî hebûn. Husîn, Colo û her du

kurikan zû zû nanê xwe xwarin û çûn li ser sikanê rûniştin. Kemêl balîfeke kevn anî da bin wan, Eşê jî çaydan, qedah û şekir anîbû. Husîn çaya Colo tijî kir, bi kevçiyê mezin şekir avêt nav û da ber. Çayek, dudu, sîsê, qala pez, qala ceh û genim û çend henekê xwe kirin. Lê Husîn dixwest şorê bine ser halê Colo, şalê wî yî hê tam zûha nebûyî, lê Colo xwe ji wir nedikir.

Husîn bi dengê bilind, lê bi henekî go «Mimagî tu çi di genim ceh tîni derê, ji min ra qalê dikî. Ka bêje tu çi şaş bûyî? Ev çi halê te ye, şalî te yî çima şil e?» Di cîh da îşqa çavên Colo vemirî kire himehim û dest bi derewan kir. Hostayê derewa bû û Husîn jî ew xuyî wî baş dizanî. Colo „Na lo, sam ningê min xwîsh bû û ez ketime çem. Vî malê Oske şulersiz jî ez dîm. Xwadê dizane. li her kesî belav kir.

Ezî ji Sefka tême. Comerde malê Şarê li yekî digere ku, li zivistanê li tereke mêske. Ez çûm, lê me li ser heq li hev nekir. Nanê min î li ser e, lê î cixarê nade ser xwe û dibêje di xaniyê kêleke gomê de rakeve. Teow, min go «na!» Qe ez neşivanekî bi şorê me. Bê birango, tu şivantiya min dizanî. Ez bixwazim, bê ku zirarê bidin zevîya, ez ê pez li orta biharê di angizan ra derbas bikim. De bê birango, cara gurekî mîyeke min xwariye?« Husîn damîş nebû, go: „Min di derewên te de anîyo! Di reqekê de deh derewan kirin. Gurên çar ning ne lê, gurê duning hindik mabû pezê te qiran bike. Him çima qiran ketiye Sefka ku ji gundî me şivanan digirine. Him Comerde heyî tune yî xwe sî pêz û kavir in. Ew ê bi xwe lê mêske. Tu yî cixare jî venaxwî. Ka rastîyê bêje, an na ez ê te bi vê êvarê bişînim gund, bi rê de gur ê te bixwin.” Colo wê tam dest bi gotinê bikira, Hes ji kêleka gomê derket û berve wan hat. “Çaxa we bi xêr. Husîn, cîran, Coloyê qûntazî hatîye ba te. Lê here ku? Nebe derew, tu destbîrakê wî yî.» go û hat li ber sikanê dawistî. «Husîn, gava din ez çûme ser çem, çi bibînim. Yekî qûna xwe ya tazî berda bû ortê xorexor bû,

radiket!” Him digot him dikenîya. “Min go ‘ez şêl bidizim, ma bi qûna tazî bi nav mala keve’, lê min qemîşê nekir.” Husîn zanî Hesî qala Colo dike û hema şora Hesê birî û go “Bes e Heso, dengsizîyê meke! Bi çî te ketiye? Merik ninge xwe yî xwîş bûye û ketê avê. Ma ê te şor bin, henek bin. Dixwazî were rûne, çayeke cîranê xwe vexwe!” Hes wê rûniştiba, lê gotinên Husîn li wî bi qar hatin. Nedixwest di bin da bimîne, lê xwe ji Husîn dipekand. “Na” go, “Remezanê brangê min î ji gund tê, îro çûbû Qulekê, ji me re teng tişt standibû. Î wana ji me re bîne, ez herim mal.” Bê ku li çavên Colo mêske “De bi xatirê we, ez herim.” go û çû.

Husîn û Colo bîstekê bêdeng man. Husîn dixwest ma Colo dest pê bike mesela xwe bêje, lê Colo nedixwest qala ew serpehatîyên xwe yên sê-çar saetên dawîyê bikira. Wî baş dizanî ku Husîn wê jê re hêrs bibe, belkî ji mala xwe jî biqewtana da. Him fêdî jî dikir. Lê Colo neçar bû, nedikarî xwe ji destê Husîn xilas bikira. Bê dilê wî jî bûya, ew mecbûr bû ku bigota, ka çi hatibû serê wî, lê hê baş nedizanîbû ku çiqas derew divê tevê bikira.

Belgefîlma Hevalê Bargiran hat mêrandin

Ecevit Yildirim

Belgefîlmê li ser jiyana û serpêhatiyên Dr. Nebî Kesen "Hevalê Bargiran" ku sala çûnî galaya wê li bajarê Hamburgê hatibû kirin, bi amadekirina Atolya Kurdên Anatolîyê li bajarê Kolnê ya Almanya careke din hat mêrandin.

Ji bo mêrandina belgefîlmê "Hevalê Bargiran" hunermend Malmîme derîyê atolya xwe vekir.

Heval û hogirên Nebî Kesen yên dora bajarê Kolnê di mêrandina film de hazir bûn.

Fîlm ji hêla rejisor Mehmed Ali Baran û bi şewirdariya Vahîd Duran hatiye kişandin.



Katherina Hoffmann



Di belgefîlm de dema zarokatî, xortanî, hatina Almanya, xebatên siyasî û têkilîyên wî yên bi malbat, dost, hevalan ve bi awayekî hunerwarî hatine li hev girêdan.

Her wiha di fîlm de dilnizmî û xatirzanîya Nebî Kesen derdikeve pêş.

Di dawîya fîlm de, dema veşartina Nebî Kesen atmosfereke hestiyar di nav temaşevanan de çêbû.

Malbata Toktamış Ateş*

Xelle Girdê (Kartzade Halil)

Malbata Ateş; yek ji sê eşîrên sereke yên Încovê, ji eşîra paravîya ye. (eşîrên din Kolomihko û Dumko). Li Încovê, ev têgeha eşîra li asta mehelî de maye. Ev sîstema li gor eşîrî bi cîh bûn heta van salên dawî berdewam kir. Her ku nifûsa li Încovê zêde bû, malbatan dest bi avakirina xanîyên li taxên eşîrên cuda kirin.

Apanên malbatên Ateş ên li Încovê îro bi paşnavên **Taşci, Firinci, Gür, Yıldırım, Demirel, Polat** tên naskirin. Navên apanên wan yên li Güzelyaylayê **Doğan**, yên li Karagedigê jî **Şener, Pekdêş** in. Têkiliyên malbatî yên bi van paşnavan vedigerin heya salên 1700an.

Bapîrên van ên hevpar teqrîben di salên 1650-1750an de jiyane.

Ji malbata Ateş bapîrî (dedê) Prof. Dr. Toktamış Ateş Mustafa Ateş ku ji Încovê derketiye, li gorî qeyîda nifûsê di sala 1891an de hatîye dinê. Ew di dema Osmanîyan de wek muhendîsê in-

şaatê xebitîye. Ew di çêkirina lîseyê ya Konya û di çêkirina rêhesinan (demiryolları) de beşdar bûye. Di dema çêkirina rêhesinan de, wî jina bi navê Hirfan ku ji Helebê an jî ji Gaziantebê bûye, nas kiriye û pê re zewicîye. Ew li gundê Agcayê navçeya Birecika Rihayê bi cîh dibin. Li vir zarokên wan; Mahmut, Mehmet, Mustafa, Ahmet û Yadigar ji dayik dibin.

Gava Mistefa di temenek genc de dimire, zarokên wî sêwî dimên. Hirfan zarokên xwe hildide û vedigere Konyayê. Ew hem li Încovê û hem jî li Konyayê dima. Ew li vir zarokên xwe dide xwendin. Mahmut û Mehmet dibin muhendîs, Mistafa mamoste, Ahmet profesor û Yadigar jî dibe bîyolog.

Zarokên Mustafa Ateş piştî qedandina lîseyê li Konyayê diçin Stenbolê. Hirfan Ateş bi Mulla Omer Kart re, ku di wê demê de li Stenbolê dijîya, bêyî ku têkiliyên hemwelatîbûnê têk bibe pêwendîyên xwe didomîne. Mulla

* Ev bi tirkî hatibû nivîsîn. Wergera kurdî: Bîrnebûn

Omer Kart her gav piştgirîya aborî û exlaqî (maddî û manevî) ji malbata Ateş re peyda kiriye. (Mulla Omer Kart gava ku di 1960î de bi-be endamê parlamentoyê vedigere Încovê.)

Bavê Toktamîş Ateş, Prof. Dr. Ahmet Ateş li Zanîngeha Stenbolê Enstîtuya Şerqî ya yekem a Tirkîyeyê ava dike û li ser edebîyata farsî û erebî kar kirîye.

Prof. Dr. Toktamîş Ateş profesorê zanistên siyasî, Yadigar Ateş mîkrobiolog bû. Wê di Partiya Komunîst a Fransayê de aktîv kar kirîye.



Yadigar Ateş û Hirfan Ateş

Prof. Dr. Toktamîş Ateş

Av. Bahattin Ateş



Mahmut Ateş
(Muhendîsê înaşetê)

Hirfan Ateş

Prof. Ahmed Ateş



Ev wêne li salên 1965-1970î li Încovê hatiye girtin



Xaniyê malbata Atês a 100 salberê, li Încovê

Zimanê min çawa ji ber destên min çû?

Rohat Miran
Şêwirmendê psikolojîkî

Birîna min, birîna min ku ez bi zimanê min ve giredayî, an jî birîna min a ku ez bi zimanê min ve ji hev qutkirî kûr e. Çiqas li ser vê kula vekirî binivîsim/dinivîsim jî ez jê têr nabim û nikarim kula dilê xwe derman bikim.

Gor nêrîna min, hetta ku zimanê min li Tirkiyê û li Kurdistanê nebe zimanê fermî, nabe ku ew kul qalik bigire, ew kul qalik nagire. Û ku rojekî ez wiha, kula min qalik negirtî bimirim, çavên min vekirî ez ê ji vê dinê bar bikim.

Zimanê min li min qedexe kirin. His, dilîn û şabûnên min, ên ku min bi zimanê xwe dihîsî ji min dizîn.

Wextê ku zimanê min ji min bi dûr xistin; min hemû peyv û navên warên xwe, hestgermîya zimanê xwe, hestgermîya dengê xwe jî winda kir. Lê ez hîngê piçûk bûm, min hîn nedizana ku çî anîn serê min.

Ez ê behsa wêneyekî ji jiyana xwe bikim, wêneyekî pir kesan ji nêzik ve dîtî, hisî û bixwe jî di nav wî wêneyî de jiyî...

Ez li gundekî piçûk, li gundekî fiqara hatim dinê. Di nav pez û berxan, golik û mangan, hêrg û zevîyan de gihîştim ciwanîya xwe. Di salên xortanîya xwe de jî li bajarekî Tirkiyê mezin bûm. Na ez ê qala xortanîya xwe nekim, ez ê qala wêneyekî ji zaroktîya xwe yê destpêka dibistana tirkî bikim.

Wê rojê roja yekemîn a dibistana destpêkê bû. Ez di nava şeşsalîya xwe de bûm. Serî sibê min xatir ji dêya xwe, ji „Gulê“ xwest û ez çûm mektewê (dibistanê).

Na wisa nebû.

Min nexwest ez ji dêya xwe veqetim û biçim dibistanê. Ez ji dibistanê ditirsîm. Jixwe dibistan ewqesî bostekê ji mala me dûr bû, lê min nedixwest ez biçim wê derê. Çima min nedixwest? Wexta ku ên ji min mezintir, ên diçûn dibistanê qala dibistanê dikirin, qala lêdan, lêxistin û mamosteyên bi xof dikirin. Ew jî ketibû mêjîya min û di dilê min de tirs peyda bûbû.

Birayê min î ji min çar salan mezintir, dît ku ez li kêleka malê,

li ber roja sibê wek kalekî heftê salî rûniştî me û kûr û neçar difikirîm. Hat ba min û xwest ku min qîna bike û min bibe dibistana tirkî. Ez girîm û qîreqîra min ezman dihejand. Min li jor jî nivîsî, gundê me û malbata me, malbateka fiqara bûn. Birayê min jî, di wir re girt û turîkekê tijî pereyên hurîk da min. Ez xapandim. Bi destê min girt û em bi hev re heta berê derîyê dibistanê çûn.

Min dît ku hevalên min jî li wir in. Sirûda „*andimiz*“ dixwendin. Min destê birayê xwe berda û min got; „temam, ez ê biçim nav wan!“ û min pereyên ku wî dabûn min jî dîsa dayê, li wî vegerandin û ez çûm nav qorê hevalên xwe.

Heta wexta saet sisiyê piştê nîvro ez bi hevalên xwe ve em li wir man. Dûvre mamosteyî por reş, em berdan û ez bi hêcanekê vegeirîm mal. Ez çûm ba dêya xwe. Ew jî di nav zibil de bû, zibil gozar dikir û ardûnê ji bo zivistanê amade dikir. Min bi coşekê ji dêya xwe re bahs kir û got ku; „Ana, tu dizanî, „navê te ne „Gul“ e, navê bavê min jî ne „Şix“ e.“ Dêya bi min kenî û got; „lawo tu dîn bûyî, har bûyî, tu çî dibêjî, kî dibêje ku navê min ne Gul e?“ Min got; „bi navê Xwedê

be ku ez rast dibêjim! Mamosteyî bi zimanê biyanî diaxifî em derxistin ser texte û ji me hemîyan navê me, navê dê û bavê me pirsî. Ji min jî navê te û navê bavê min pirsî. Min jî got ku navê dêya min „Gul“ e, û navê bavê min jî „Şix“ e. Wî mamosteyî rûyê xwe li xwe qerçimand û got; „naa, ew ne rast in! Navê dêya te „Gülsüm“ e û navê bavê te jî „Ahmet“ e!„

Dêya min li min nêhirî û qet tiştêkî din negot û serî li xwe ba kir û berdewam puşqilên li ser gozerê werdan. Pişqul li ser gozerê vir de û wê de dipekîn.

Ez û hêcana min, ku min digot qey ez fêra dinyayeka nû, zanayê tiştêkî nû bûm, li ba hev man. Hêcana min di gewrîya min de wek kevîrekî ma. Min heta „ortaokulê“, heta dibistana navîn nedizanî çî bi serê min de hat. Hîngê ez pê de çûm ku ew hêcana min li ser dilê min bûbû kevir. Heta îro jî ew kevir ji bedena min derneket, na, di gewrîya min re xuşî û li ser dilê min rist.

Ji wê rojê şûnve û bêhtirî çend salan, ez „lal“ bûm, her tiştî ku min navê wan dizanî, êdî ne rast bûn. Ez di nav zimanekî biyanî de sêwî mam û kokê peyvên min qetîn,

k(g)er bûm, û bûm ne tişt, jixwe ku tiştekan bûma, navê dêya min nedibû „Gülsüm“!

Dem hat û çû, ez ji mamosteyî xwe baştir fêrê wî zimanê biyanî bûm. Lê ez bi wî zimanê biyanî, çiqas modern bûm, çiqas bi pêş ve ketim, nizanim. Gelo ew zimanê biyanî bixwe, zimanekî çiqas modern bû, bi wê jî nizanim.

Lê tiştî ku ez pê dizanim, roja ku ez ketim ser rê û çûm mekte-

wê vir de, ji wê rojê pê ve, ez ew kes im, ew ê di nav peyvan de his û hestgermîya xwe û rihê zimanê xwe, rihê gotinên xwe windakirî me.

Aniha ez fêrî kîjan zimanê dibim, bi kîjan zimanê diaxîfim; ez pê dihêsim ku ez hîn zêde ji xwe dûr dikevim û dibim biyanîyê xwe. Û wek filozefekî hertim pirsek di serê min de tevdigere; gelo ku ew peyvên ez fêrî wan dibim jî ne rast bin?



AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatolîya Navîn wêneyekî kevn di *Bîrnebûnê* de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatolîya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatolîyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmançiyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Vegere

Dema te dest kişand
Ser birînan
Min ew kewandin
Bi êş û janan
Tu çûyî
Evîn penaber e
Dil dişewite
Hertim li nalîn û keser e

Tenê mam li van waran
Te nekire xem qet
Ketim, rabûm çend caran
Tu nehatî malneketê

Dibe ku rojekê
Vegerî van diyanan
Baş binêre li neqewan
Serê neqewekê ji wan
Dixwaze gora min
Bihata kolan
Bin darek gûzan
Dorpêçkiri be
Bi keviran
Were seredanê
Ji bo dil û xatiran

Negirî ha!
Çavên reş û belek de
Nehêrikin
Hêsrên wek tavên baran
Dil ê biêşe
Bin axa sar kes nîne
Birîna min bikewîne
Bi dildamayîyê te me
Li van neqewan
Bi hesreta silavek
Dost û hevalan
Û
Çend rêwîyan

Mem Xelîkan

Li vî warî

Çavên xwe veke
Û
Xwaş mêzeke
Teyr û tû
Neman li vî warî
Hêlîn xelandîne
Kew kevok û qulingan
Per û bask şikestî
Koçkirin ji vî warî
Dayîkên hêvîyên xwe
Baskên wana de veşartî
Mane çav bi girî
Nexemilî ne
Keçên çav kesk û wek morî
Reş girêdane
Bûkên dest bêhinne û çav kilnekirî
Baran jî nabare
Li vî warî
Stûxwar û çilmisî ne
Gul û kulîlkên bihar şîndikirî
Ez
Kalekî xew û xevn bi nîvi me
Benda stêrka sibê
Bi lore lora dengbêjekê
Paşila xwe de
Hêvîyê dihevînim e.

Mem Xelîkan

Ew di şevên tarî de stêrka sibê bû*

Salên 70yê... bi dehan xortên kurd, ji Amed, Mêrdîn, Dêrsim, Riha, Sêrt, Warty û hwd. xwendina dibistana mamosteyê li Kirşehirê bi dest xistibûn. Sibehek di seqema Anatolîya Navîn de min xwe gi-hand bajêr û dibistanê... Li gor „hêvîyên“ wan dema di derbarê „xwendinê“ de em ê di „derîyê dewletê“ de bibûna mamoste... Pîranîya me ji jiyaneke gundewarî ha-



tibûn û em hîn 14-15 salî bûn. Kirşehir û dibistan ji bo me derfetek nû, dijwar û xerîb bû...

Lê stêrkek mîna me, ku ew jî ji axa xwe hatibû destbirîn li me derket, li me bû sîwan û ronî...

Mamoste Seyid Alp, kurdê Anotolîya Navîn, ji ax û dîroka xwe sirgûn!..

Ew ji me re bû parêzvan, bû dengê êşa xwe (me), qêrîna çanda kurdî, stranên govendên azadî û wekhevîyê. Zana bû, wêrek bû, birra bû, heval bû, rêber bû, mamoste bû...

Ya herî bilind hevparê dîroka xwe/me, dîroka kurdan bû!.. Di çanda me kurdan de “sîng” weke mêrxasî tite pênasîn... Serê wî her bilind, sîngê wî her li pêş bû, bawerî dida mirov... Ji ber ku ji xwe, doza xwe, rêya xwe bawer bû... Ji ber ku, bazikên ev hêvîyên xwe bi coşek mezin dixwest li me bar bike, xwezî û hesretên sed salan li me dikir mêvan... Ta ku em bikaribin xwe nas bikin... Dema ku helbest û edebiyat li me eşkere dikir, xwe

*Sernivîs: Ji nivîskarê kurd birêz Receb Dildar e ku ew bi xwe yek ji şagirtê Seyid Alp e û diyar dike ku bi wergera romana Seyid Alp ya bi navê *Dewran* ji bo kurdî, wî „deynê“ xwe ji bo mamosteyê xwe hinek „sivik“ kiriye... û destnîşan dike ku di nivîskarîya xwe de, mamosteyê xwe Seyid Alp her wekî çirûskên berhemên xwe dizane.



Grûpek ji şagirdên Seyid Alp

bera nav deryayên xem û xeyalên xwe didan û em jî bi xwe re dikişandin nava govenda pêşerojan... Evîn, mêrxasî, xwezî, sirgûnî, her çend “ziman” tirkî bû lê cewher/gelerî-çirûsk û tîrêjên havênê kurd û kurdperwerî bû... Carnan tê pirsîn; Têkiliya/„yekrêziya“ mamoste Seyid û şagirtên wî, hêjayî lêkolîna ye... Çima gelo? Rast e. Bi ya min ev hêjahîya „dûalî“ ye...

1- Seyid Alp, yek ji destqetandîyê welatê xwe, sirgûnîya ji warê bav û kalan bû ku li Anatolîya Navîn bi cîh kiribûn. Wî çîrok, lorîn, evîn, stranên axa ku jê hatibû qetandin qet ji bîr nekiribû.

Em di vî warê de, jê re bûbûn sebir û bîhna xwezî û doza wî/axa

wî, ramanî (kurdperwerî). Bi me re carnan bi kurdî diaxivî, dibû rêber û rênîşander...

2- Me ji wî kilit û mifta xwenasîyê peyda kir. Piştî ku em mezûn bûn, di mêzîna jiyane û tevgera dewletê de, bêhtir me dît ku „kurd bûn“ çi ye, çawa ye? Wan deman me (şagirtên wî) mamos-



Ji milê çepê ve: Xalit Temli, Ibrahim Yaşin, Nebi Karaaslan, Huseyin Udum.

te Seyid, bêhtir fam kir û li dora sîwana ku wî ji me re nîşan dabû, civiyan.

Em wekî fizîkî ji hev dûr ketibûn lê doza me, rêya me, xewnên me wekî kurd û kurdperwerî yek bûn..


Her ku me pirtûkên wî dixwendin (çendîn bi tirkî bûn jî); *Şawk*, *Welat*, *Dewran*, *Dîno ile Ceren*, diyar bû, tevna ruh û çanda me yek bû... Lorîn û hêsirên li

ber dergûşan yên dayîkan yek bû... Meşa stranên xwezî û dengbêjîya di nivîs û pirtûkên wî de yek bûn...

Em bi „xwe,, bûn... Ew bi „xwe,, bû... Ji ber ku „em,, bûn...! Em kurd bûn...

Em ê te û doza te, ji bîr nekin mamosteyê min. Bi dehan şagirtên te; şopajoyê xewn û xeyalên te ne...

Xalit Temlî
Yek ji şagirtên we...



Ji milê çepê ve yên ji pëyan:
Edip Şeşoogulari, Huseyin Udum,
Mehmet Sevim, Nasuh ... , Ismet Malkoç
Yên rûniştî:
Xalit Temli, Ahmet Ay, Ziya Payam.

Reşo - 3

Ecevit Yıldırım

Piştî mineqeşeya bi Firêt re, Reşo ji camîyê û quranê bêhtir sar bû. Zaten jê hez nedikir. Ew mineqeşe jî jê re bû manekê. Tiştên ku di demên dawî de li ber çavê Reşo diqewimîn, di jiyana wî ya hundirîn de mîna zelzeleyekî bandor li ser wî dikirin. Tiştên ku di teorîyê de dihatin qal-kirin, di pratîkê de qet eleqa xwe pê tunebû. Xoce ji ayet û hedîsan her roj qal dikir. Çi digot; „*Jiyana însana tişteki pîroz e. Jiyana ku Xudê daye, encax Xudê dikare dîsa bigre*“ filan û bêvan. Saddam bi hezaran helepçeyîyên sivîl kuştibûn, lê ew ne xema ti misilmanekî bû! Qala hedîseke Hz. Pêxember dikir û digot; „*Kesê ku tiştê ji xwe re xwestî, ji birayê xwe yê misilman re nexwaze, ji dil bawer nekiriye.*“ Zilma ku li Bûlxaîstanê li tirkan dihat kirin, li Tirkîyê jî li kurdan dihat kirin. Çima ew hedîsa Hz. pêxember nedihat bîra ti misilmanekî? Wekî din jî xoce qala tiştên xof jî dikir.

Carekê cejna qurbanê bû. Berî civat here qurbana xwe serjê bike, li camîyê kom bûbû. Edet weng bû. Xoce jî li ser dîroka qurbanê û Hz. Îbrahîm çîroka malûm du-

bare dikir. Di nav de xoce ji civata hazir re pîrsek kir; „Ey cemaat-î muslîmîn, hûn ê niha herin û qurbana xwe bibjêrin û serjê bikin. Ma hûn dizanin ew mîyên qurbanî di hundirê xwe de çi dibêjin? Gava hûn diçin yekê ji wan bibjêrin? Ew di hundirê xwe de dibêjin: Ya rebî xweskê ez wek qurbanî werim bi-jartin, ez werim qurbanîkirin! ,

Piştî dengkirina nimêya îdê civat bi temamî rêya çîfliga qurbanan girtibûn. Li çîflîgê jî hewşoyekî ku bi qasî 50-60 mîyên ji bo qurbanîyê hazir bûn. Gava kesên ku ji bo qurbana xwe bibjêrin li derîyê hewşo li mîyên qurbanî dinêrîn, mîyên qurbanî jî wekî ku çi bê serê wan zanibin, her ku yekê xwe nêzikî wan dikir bi temamî xwe ji wî quncikî bi hemû hêza xwe, xwe davêtin quncikê din.

Bibe nebe Reşo gotinên xoce û bertekên heywananên bêguneh dida ber hev û di ber xwe de go; „*Ya xoce bi vî îşî nizane, ya jî di vî îşî de îşek heye.*“ Ji ber van bûyeran her ku diçû bêhtir ji camîyê sar dibû. Heta ku xoce jê tişteki pîrs neke, teve dersên din jî nedibû. Eger bi ya wî bûya,

ningê xwe jî bi camîyê nedikir. Lê ji ber tîrsa bavê xwe neçar bû. Bavê wî li bendê bû ku bawermendekî xurt jê bi derkeve. Lê ew jî, ji niha û pê ve zor xuya dikir. Çûyîna camîyê hêza xwe tunebû li ber bisekine. Lê ji bo mîtinga tirkên Bûlxaîstanê biryara xwe dabû. Wî yê bi şiklekî xwe jê bikira.

Êvarê dolmîşa camîyê weke herroj hemû talebe çing ji malê digirtin û dibirin camîyê, weng jî dibirin li malê dihîştin. Li malê, dêya Reşo, Elê hazîrîya xwarina êvarê dikir. Bîneke xweş ji aşxanê dihat. Bîna zêd bû. Elikê nanê sêlê lêxistibû. Her ku nanê sêlê lêdixist, pê re zad jî dikeland û li ser dikir. Tabî ku zad li ser nê, gerek dew û pîvaz jî jê nemînin. Bi gotineke din, Ne tenê xwarina gund, atmosfera gund jî bi xwe re anîbûn nava Ewropayê!

– Here destê xwe bişo, xwarin jî hema hazir e, Elê bang kir.

Bavê Reşo Candilo jî, ji kar hatibû û cihê xwe li ser sufrê girtibû. Reşo jî destê xwe şuştin û hat cihê li ser sufrê girt. Di nav xwarinê de Candilo got;

– Eee, kî ji we roja cumartesiyê yasîne bixwîne li Kolnê ? Firat ya jî tu?

– Ma ji Firat û min bêhtir kes

tune ye ku yasîne bixwîne li camîyê?

– Qey hûn baş bi quranê dixwînin ya, loma!

– Wele ez ti yasin-masîne naxwînim!

– Çima?

– Îşê min tune ye ji tirkan re, ji tirkên li Bûlxaîstanê re quranê bixwînim!

– Lo te serî xwariye çir kiriye, hertiştî bi kurmançiyê ve girê didî?

– Tamam de, tiştên ku li Bûlxaîstanê li tirkan tên kirin, li Tirkiyê jî li kurdan tê kirin. Çima kes ji bo kurdan dengê xwe dernaxîne?

– Lo yowrim, salên te çî ne, bejna te çî ye? Tu radibî gotinên ji bejna xwe bilindtir dikî. Ma xoce nizane, ewqas mîlet pê nizane, tu pê dizanî!

– Qey ne şert e însan profesor be! Wek reş û spî li ber çava ye. Tiştên ku Bûlxaîstanê li tirkan tê kirin, Li Tirkiyê jî li kurdan tê kirin, ew neheqî ye, xelas!

– Lo tu kême î, eksig î çing î! Min ji te ra cara din jî got; em ne kurmançên heqîqî ne, hêleke me tirk e!

– Madem weng e, ka ji min re bê; dêya te bi yek kelîmeyeke tirkî dizane?

– Dêya min bi stuyê te neketiye. Tu yî ji kera yî çing î? Careke din li ba min qala kurmançiyê meke.

Ez ê ningên te bişkînim. Ez ewqasî mesref lêdikim, ma dîn û diyaneta xwe bevîse, ew jî ji min re rabûye qala heqê kurmancan dike, la hawle wela... kêm bibe ji ber çavên min... hayde!...

Cara siftê bû ku bavê Reşo bi vî awayî lê hêrs bû. Reşo tirsîya. Serê xwe kir ber xwe û ji cem bavê xwe bi dûr ket. Lê di nebeşdarbûna mîtinga Kolnê de jî bi biryar bû. Ji hêla din ve dixwest pîrsa Dêrsim û kurdên heqîqî jî di aqilê xwe de zelal bike. Lê belê ne kesek hebû, ne pirtûkek hebû ne jî tişteki din. Dêrsim wek pîrseke mezin li ber wî sekinî bû. Bi wî awayî ew hefte jî derbas kiribû. Çû camîyê hat. Gava roja mîtinga li Kolnê hat, ji nivîna derneket. Xwe li nexweşiyê da. Hêdî hêdî dest bi nalîn û kuxikê kir. Bi dengê kuxika wî dêya wî Elik hate cem û got;

– Va çi ye ?

– Oy... nizamim, qirika min mîna kêrê dibire, diqefilim etê.

Elikê destê xwe bir ser eniyê û li alafa wî mês kir.

– Wî te serma girtiye lo...

– Etê bavê min re bê; Reşo pîr nexweş e, nikane here Kolnê ha...

– Erê lo te xwe şaş kiriye dema Kolnê ye niha? Di wê navberê de

bavê Reşo Candilo jî hat hundir.

–Va çi ye, çir bû ?

–Tu nabîni! Lawik giran nexweş e, alafa xwe heye.

Siftê bi guman lê mês kir. Reşo jî xwe bêhtir da ser kuxikê, urt, urt, urt...

– Di vê germa havînê de nexweşiyê xwe şaş kiriye? Bi dengêki pîr nizm û nexweş;

– Dihû me bi hevalan ve dondirme xwaribû, qey ji wê ye...

– Temam, tamam... Dêrdê te, tu nerî mîtingê ye....

Di wê navberê de dolmişa camîyê jî hat. Candilo neçar ma û bi tenê lê sîwar bû. Elikê jî hema kaseyek şîr germ kir, tenik hengiv jî tevê kir û jê re anî.

– Vî şîrî vexwe. Heta tu şîr veduxwî, ez ji te re nên sur bikim. Parîyek nan jî bixwe, ma tu bi xwe de werî.

Reşo şîrê xwe vexwar, kuxika xwe birî û hîn dêya wî banê nekiribû bi xwe çû cem.

– Ka nanê min çir bû?

Dêya wî lê mês kir û bi awayekî matmayî:

– Va çi ye? Te heta du deqa ber vê nale nal bû ji ber nixweşiyê, tu çi zû xweş bûyî?

– Etê, dengê xwe meke. Bavê

min wekî din bi gura min dikir? Zaten bi Mehmikê Omera ve ning dane ningê hev, qaşo misilmantîye dikin. Misilmantîya çi ye? Tobe... ji xwe re di bin navê misilmantîyê de xizmeta xelkê dikin. Ma derdê tirkên Bûlxaîstanê ji bavê min û Mehmikê Omeran tê pirsirin. Tirkên Bûlxaîstanê ji xwe re dikin derd, ma tenekê jî derdê me kurmancan ji xwe re bikin derd! Derdê me ji derdê tirkên li Bûlxaîstanê ne siviktir e!

– Heşê min nagihên va tiştana. Ya ku ez dizanim, te bavê xwe xapand. Ku ber da çû, yê ji te re kat ke.

– Temam, tamam. Tu wî îşî ji min re bihêle.

Reşo zikê xwe têr kir, kincên sporê li xwe kirin û xwe ji malê avêt derve. Bîstek ber nîvro bû. Eyam jî xweş bû. Berî here qada sporê li ber malê dawestî, hemêza xwe vekir û nefeseke kûr kişand hundirê xwe. Nefesa azadîyê bû. Îro xwe camîyê, quranê, ji meş û mîtinga Kolnê xelas kiribû. Azadî tişteki xweş bû. Îro bi têra dilê xwe dikarîbû bi tevî heval û xortên gund bi futbolê bilîze. Bi kelecaneke mezin da rêya qada sporê. Li qada sporê wekî herdem hemû xortên futbolîst kom bûbûn. Reşo xwe gihande wan. Siftê hinek sohbet, muhbet, yarenî û henekên xwe

bi hev kirin. Pişt re di nav hev de du kom çêkirin û dest bi futbolê kirin.

Di wê navberê de Memo jî hat. Li ser bankekê ku li kêleka qada futbolê bû, rûnişt û ji xwe re li maçê sêr dikir. Memo kurdekî ji Mereşê bû. Malbata wî ecer ji welat hatibû û serî li penaberîyê dabû. Memo du-sê sala ji Reşo mezintir bû. Piştî maçê Reşo hate cem Memo. Li hal û xatirê hev pirsîn. Ji Memo re qala bûyera li camîyê û filmê ku ji bavê xwe re çex kirî kir û bi wî awayî muhbet kûr kirin. Reşo ji dengkirina bi Memo re hez kir. Ew jî mîna wî kurdek bû. Neheqîya ku li kurdan dihat kirin wî jî qebûl nedikir. Li kurdbûna xwe xwedî derdiket. Ew yek dibû sedem ku herdu heval bêhtir nêzikî hev bibin. Pirsra ku Reşo jê re li bersivê digeriya, xest bi Memo re parve bike.

– Memo, bavê min dibê em ne kurdên heqîqî ne. Kurdên heqîqî kurdên Dêrsimê ne. Qey ew rast e?

– Kî kurdê heqîqî ye, ne heqîqî ye, ez nizanim. Lê ez yekî ji Dêrsimê nas dikim. Eger tu bixwazî em dikanin herin ji wî pirs kin!

– Bi min, ya bir rind bibe. Kî ye ew kesê ji Dêrsimê?

– Apê Haydar e. Hevalê bavê min e û ji Dêrsimê ye. Pir jî zana ye. Ku bizane bizane, ew ê bizane.

– Memo, madem weng e, em ti zeman wenda nekin û herin cem. Mala wî li ku ye?

– Ji vir sê- çar km dûr e. Eger tu bixwazî, em dikanin niha herin wî bibînin.

– Temam, em qet danewestin, em hema niha herin cem apê Haydar û jê pirs kin.

Li gor Memo qal kirî, apê Haydar kesekî zana bû. Pirs ku ji demekê vir de serê Reşo dagirtibû, di Memo jî geriyabû. Li Memo jî êdî meraqa eslê kurdan peyda bûbû. Memo jî dixwest binyada kurdan bevîse. Heta mala apê Haydar li ser wê mijarê ji xwe re deng û şîrove dikirin. Li dibistanên Almanya qala dîroka Almanya û almanan dihat kirin. Almanya û alman çî ye û kî ne kêma û zêde Reşo dizanibû. Memo jî li dibistanên li Tirkîyê, dîroka Tirkîyê û tirkan fêr bûbû. Lê belê di derheqê kurdan û dîroka wan de, ne sazîyek û ne jî dibistanek tunebû kû qala wan bike. Te digo qey kurd li ser vê dunyayê qet tune ne, ya jî ne ji vê dunyayê ne. Ti qîmeteke kurdan, ziman û dîroka wan tunebû. Halbûkî, sedema ku Memo û Reşo nêzikî hev bûbûn û bingeha hevaltîya ku di nava wan de hatibû avêtin, di saya kurdbûna wan de bû. Her yek ji wan jî bajarekî

bû. Yek ji Konyayê û yê din jî ji Mereşê bû. Lê belê herduyan jî bi eynê zimanî, bi kurdî deng dikirin. Her du hevalên ecer, bi rêwîtiyeke bi lez xwe gihandin mala apê Haydar. Memo xwe da pêş û li deriyê mala apê Haydar tikand. Bîstek bi şûnde, deriyê malê ji hundir ve vebû û mêrikekî gir û girs bi simêlên pan li hember du hevalên xort rawestiya. Apê Haydar Memo nas kir. Bi ruyekî kenokî dilxweşîya xwe bi serdana Memo û hevalê wî jî nişan da. Bi tirkî herdu hevalên xort xêrhatî kirin û ew vexwendin hundir. Her du heval, li cihê ku apê Haydar nişanî wan da cihê xwe girtin. Reşo pir bi kelecana bû. Ji ber kelecane kofîka destên xwe di hev dida. Tilîyên xwe diguvaştin. Hinekî fedî jî dikir. Gelo apê Haydar niha ji wan re qala çî bikira. Gelo rast bû gotina bavê wî? Çî ferq di nava kurdên Dêrsimê û wan de hebû? Apê Haydar careke din xêrhatina xortan kir û li halê wan û li hal û xatirê bavê Memo pirsî. Apê Haydar tim bi tirkî deng dikir. Ew yek li xofa Reşo diçû. Eger weke gotina bavê wî bûya û kurdên Dêrsimê kurdên heqîqî bûna, wê demê lazim bû ku apê Haydar bi kurdîyeke herî xweşik û zelal deng bikira. Lê şûna wê apê

Haydar bi tirkîyeke stenbolî deng dikir. Heta ji tirkîya pir tirkan jî baştir bû. Heş û aqilê Reşo ji ber wê tevlihev bûbûn. Nedikani maneyekê li tirkîya apê Haydar bar bike. Li dû xatirpîrsîna apê Haydar, Memo jî li apê Haydar pîrsî. Reşo da naskirin û sedema serdana wan ji apê Haydar re eşkere kir. Gava apê Haydar sedema hatina wan êvisî bû, kenek li ruyê wî peyda bû û got:

– Emrê we hîn çî ye xortno? Ne zû ye ji we re, ku hûn serê xwe bi pîrsên weng giran dêşînin?

Li ser vê gotina apê Haydar, Reşo bi dengê fedokî û bi kelecana merama xwe bi tirkî anî ziman:

– Apê Haydar, wekî tu jî dizanî, li Helepçeyê kurd bi bombeyên kîmyewî hatin bombabarankirin. Pênc hezar însanên bêguneh hatin kuştin. Dunya jî li hember vê hovîtîyê bê deng mabû. Ez wek kurdekî ji Konyayê pir bi ber ketim. Min ev yek di nav malbata xwe de jî anî ziman. Lê belê bavê min ji wê aciz bû. Ser de jî ji min re got, ku kurdên Konyayê ne kurdên heqîqî ne. Lê kurdên heqîqî kurdên Dêrsimê ne. Ez dixwazim bizanim, ka bavê min rast gotiye yan jî na? Hevalê min Memo got, apê Haydar bi xwe ji Dêrsimê ye û însanekî

zana ye. Loma em hatine cem te. Gotina bavê min rast e, ku dibê kurdên heqîqî kurdên Dêrsimê ne?

Apê Haydar li ser vê pîrsê bişirî, ji şûna xwe rabû û ji bo xortan du vexwarinên ava fêkîyan anî û da ber xortan. Bi xwe jî li hemberî xortan rûnîşt û bi Reşo re got:

– Baş e ku tu li zilma ku li Helepçeyê hatiye kirin qebûl nakî. Jiyana meriyan tişteki pîroz e. Dîn, mezheb, ziman, etnîsîte, nijad, deng û rengê meriyan çî dibe bila bibe, gerek herkes rêzê li hev bigre. Însan gî birayê hev in. Însanê baş hene û yên xerab hene. Kî li dij neheqîyê derkeve, ew însanê baş e.

– Rast e apê Haydar. Ez dixwazim pîrseke din jî li te bikim; ti çima bi kurdî deng nakî, şûna wê bi tirkî deng dikî?

Apê Haydar dîsa bişirî û got:

– Ez bi kurdî nizanim xorto. Hendik fam dikim, lê nikanim deng bikim!

Reşo bersiveke weng qet nedipa, şaş bû.

Destê xwe bir bin çenga xwe û vir de wir de mist da. Berê xwe ber ve Memo kir, li çavê wî mês kir û mîna ku bê; ka te digo Apê Haydar însanekî zana ye, bi her tiştî dizane. Hîn bi kurdî nizane, mijarên din

wê çing bizane. Memoyê xizan jî mat mabû. Tenê li çavên Reşo mês kir û mîna ku bê; min jî ji vî îşî tiştêk fam nekir û devê xwe qerçimand. Rewşeke enteresan bû. Du heval bi kelecaneke hatibûn cem apê Haydar, ku ji wan re qala binyada kurda û bi taybet jî kurdên Dêrsimê bike. Lê apê Haydarê ku di çavên xwe de ewqas mezin kiribûn, hîn bi kurdî nizanîbû. Dibe ku sedemeke taybet hebe, ku apê Haydar bi kurdî nizane, difikirî Reşo. Ji ber wê jî pirsê esas ku lê digeriya careke din dubare kir;

– Apê Haydar, bavê min dibê, kurdên Konyayê ne kurdên heqîqî ne. Kurdên heqîqî kurdên Dêrsimê ne. Rast e va yeka?

– Xorto, bavê te çima wer gotiye nizanîm. Lê rastîyek heye; Hûn bi kurmançî deng dikin û ji hev fam dikin. Em li Dêrsimê bi zazakî deng dikin. Loma jî em ji hev fam nakin.

– Apê Haydar Zaza çi ye?

– Pirañiya kurdan, mîna we kurmanç in. Zaza jî tenê li Dêrsimê û herêmên nêzikî Dêrsimê hene. Yek jî em Dêrsimî elewî ne.

– Yanî hûn ne kurd in, apê Haydar?

– Ya rast xorto ez jî tam nizanîm.

Hinek di nava me de hene dibêjin zaza mîletek bi serê xwe ne û ne kurd in. Hinek hene, dibêjin zaza beşek ji kurdan in û zazakî jî zaravayeke kurdî ye. Lê ya rast ew e, ku em li Dêrsimê komeke piçûk in. Bi zimanê xwe, bi mezheb û çanda xwe em cuda ne.

Gotinên apê Haydar digot, tiştên ecer bûn. Herdu heval jî tiştên ku apê Haydar anîbû ziman, cara siftê dibihîstin. Reşo nedixwest benda vê pirsê berde. Careke din ji apê Haydar bi şikleki eşkere pirs kir;

– Apê Haydar, xuya ye ku rewşa we jî mîna kurdên me yên li Konyayê tevlihev e. Wê çaxê kî kurd e?

– Xorto, madem tu bi israr li dû vê pirsê digeri, wê demê here cem kurdên ji Mêrdîn, Şirnex û Colemêrgê. Ew bi her tiştê xwe kurd in. Bi ziman, çand, rabûn, rûniştin, cil û berg. Kurdbûna qedîm li ba wan veşartîye!

Reşo û Memo bi kelecaneke hatibûn cem apê Haydar. Lê tiştên ku jê bihîstin ne bersiva pirsê wan bû. Ji xwe re hinekî din li cem apê Haydar rûniştin û pişt re xatirê xwe jê xwestin ji cem veqetiyên.

Kurdîzwanî û kultûrmendî

Rûjhat Esîman

Le ey cîhane mêrikatî, pergalê hemgîyanîye we rîwazgeli wînebarî, ejnewbarî û destlêbarî ew firêvîne xistige. Kargeli wînebarîreg, Hunerê Wînige; kargeli ejnewbarîreg, Hunerê Muzige û kargeli destlêbarîreg îj Hunerê Peykere derxistige. De nawi ey karîngeli vîne-vîne, zwane, hestîne xwê derhawirdige we mêrikel û we hezaran sal ra mêrikatî wîge tiştî wesûd û yardimkar. Je wextê mêrikeli meymûnwarî ew duyace dengeli gelu û xirnatik îj lê zîye kirdigîn û zindeganîyeman we hemgîyanîyîki firêdeng û firêrîman ew dewlemend wîge.

We wilawwîyîni mêrikeli meymûnwarî, erdnîgargeli ciyîciyî hatin ewdîyin û keşfkirdin. Tiştê girîng û balkîşe eya ke, ey erdnîgargel we xak û iklimê xwêyan ew nêminine we yekîtinî. Eye; firêvîneyatî derdixî. Mînak, zwani mêrikel i Afrîkayî û yi Ewrûpayî eynî nîyin. Raçegîne ewestin ke, heta îmro, îme ra xwêifadekirdine dengeli dem we kar hawirdigîn. Verce, dengeli lew û zwane

derxistigîn, iklim û cografyay cîware, taywetîgeli xwê dixî seri mêrikeli xwêmal û zindargeli ewre. Je eye ew; îme ditanîn wiwîşîn ke formê zwane çe ewdigûrî.

Mêrikeli Mezopotamyayî û yi Asyayî le naw xwêyan taywetxawind in, welê ra hembesîye îme nêtanîn we zûlalî deng û demeqal wikerîn. Rake, taywetîgeli xake, lewere, awe û ajele yi cîware; bani xwê-formandinîki rîzwanî ew astengî didî we hembesîye. Le Mezopotamya du çemi nawdar we nawi Dîjle û Ferat hestin. Bî şûphe estin ke zindeganî û cîwtkarî le cîyegeli ke awistanî hestin, zîyetir û zengîntir in. Ra ewe, eke le zwangeli sereke yi cîhane dingerîn, yekeli ke firêyîni gî dîyan wekarhawirdin de wextê konare le cîgeli we çem hatigin qisekirdin. Zwangeli kurdî îj, ra ewe zengînxawind in û xwêyan peristigin. Helwet, le cîyegeli ke we zwani firêvîneyatî hestin, kultûr îj derdikefî. Zwane û kultûre, d'ey seysale verdi yek dîyan telafûzkirdin. Rake, herdik îj, yekîtinî gewre û verew-

xistag dikerî. Welê, l'eyre cîyatî hestî ke, kultûre pašmayîxwaz e; je nûjenxwazîye (modernîzm) hez nêkerî. Ra eye, kultûr hemigi taywetîgeli etnografîk, cografîk û dîrinîye bar dikerî pîşti xwê. Zwane, we dijverî; nûjenxwaz estin. Rake, eke xwê nûjen nekird, de seysalê fezaye û ferazîye nêtanî xurt û palistag wimînî. Ra ewa ke îmro we jimari seygel mirdinîyi zwangel derdikefî. D'ey zwangeli mirdig û vermirdig rîmangeli teknolojîk, hunerî, kînetîk, zanistî û rûjane nîyay wekarhawirdin. Hetta, wîşig û rîmangeli dermal (biyanî) zinde dîyarî we î zwangel û bîndek eyane verew diwerî.

Mêrikatî, kem-kem diçû we yekzwanîye. Îmro zwani englîzî heman îj hêgemonyatîyi xwê şani cîwargeli neaktîf û nexurt didî. Le parzemîyê Afrîqa, çend hezar zwan hestî, baş nêzanim welê duya 40-50 sal çend zwan ha wimirî eye we verkeftî ha wîyay zanistin. L'ey parzemîye zwangeli hêgemonîk englîzî, espanyolî, portûgalî, fransî û kemîk îj erewî estin. Mêrikeli Afrîqaza we mejwûrî yan bandûrî yekî-duwan je î zwangel dizanin. Ra eyestî, le hemveri seysale, vistey zwane û kultûre eynî nîye.

Îmro, le zwangeli kurdî vêgeli sereke eyane yin. Le ser zwane kargeli xweş hewû îj, we etnografîk zîye tişt heman nehate kirdin. Huner, edebîyat û muzigi Kurdgel je zwane kemtir verew diçû. Ey vista, nûjenwîyini zwane vistag dixî. Her kari huner, sedî 60-70 we eynigi folklorîk û klasîk ew dîyay amadekirdin. Helwet, qet nêwîşime ke huneri klasîk xeraw estin, îme ke îmro we kurdî qise dikerîn, we sayê klasîkatîyi edebîyatiman û muzigiman e. Welê, îmro derfêtgeli gerdûnî jêman tiştgeli zîyetir dixwazî. Eke nêxwazê wimirê, zîyetir kar ha wikerê û paşerîvani cîhanê hemdeme ha wiwê. Hunere, de nawi zwane û kultûre dimînî. Yekî nûjenxwaz e, yekî îj pašmayîxwaz e. Helwet, le îre îme nêtanîn kurdîzwangel sûcdar wikerîn. Viste û şertgeli îmroyîne je paşerûje magin. Lûzim hest ke eyane wîyarîn veri çew. Kurdîzwangel, xwêzin weşanxanigel paşerî wikerin û kîtiwgeli nûjen yan konar wixwînin. Ra eye, barê weşanxanigel, nuskargel û xwendevangel firî ye. Edebiyati kurdî, xeylî lûzim hest ke zîyetir verew wiçû û esergeli gewre bari xwê wikerî. Xwendevangel wila Tolstoy, Dostoyevskî,

Gogol, Shakespeare, Kafka, Balzac, Umberto Eco, Calvino, Albert Camus, Sartre û yekeli din we kurdî wixwînin û we kurdî le seri eyane demeqalîgeli hunerî, zanistî û sosyolojîk wikerin ke zwane xurttir û xwêyan zanyartir wikerin. Yeki ke Ehmedê Xanî xwendige, wila Shakespeare û Dante Alighieri îj wixwînî û analîzgeli sosyolojîke we rîyi edebîyate wikerî. Le cîhane, he-ta ke dewlemendîgeli klasîk nîyan şîrûwekirdin, yekeli nûjen baştir nîyan analîzkirdin.

Xwendevanîki Engliz, lûzim diwînî bawikê zwani englîzî Shakespeare winasî; xwendevanîki Îtalyan, lûzim diwînî ke bawikê zwani îtalyanî Dante winasî. Ra îme îj Ehmedê Xanî, Pîremêrd, Melayê Cizîrî eçe yin. Klasîkel ra ewe firê girîng in. Tena, ra î seysalê nûjene îme firê hewcedar in j'eyane dewlemendîgeli nû derxîn û şîrûwe wikerîn. Îmro, weşanxanigatî we zwani soranî firê baş e.

Welê, dixwazim l'eyre mijare wîyarim seri elîfba / nustiknama. Çunde ke îwe îj dizanin, nustiknamey zwani soranî we aramî estin. Ra eye, bawermend im ke kurmancîzwangel û zazakîzwangel zuritî dikîşin ke we soranî

wixwînîn. Dîyar estin, qiti ke nustiknama we latînî diwû, mêrikel kemî din baştir ditanin wixwînin. Raçeyîni ey nustine, xwendini esergeli klasîk wîge û yek îj le lay ewane dîyay gumankirdin ke zwani soranî we aramî-nuskî ew baştir dîyay peristin. We gumani min, ra ey serdeme qet lûzim nîye ke we aramî-nuskî wîyay nustin. Rake, îmro zwangeli nêz-elîfba zîyetir asan dîyan taşîn û taşandin. Qenci eye, aramî-nuskî fonetiki zwane nêtanî we tamamî widî hemvere. Î kare we latînî-nuskî ew we rehetî dîyay kirdin. L'eyre, ra zwangeli kurdî nûjenî girîngtir estin. Duya soranî, zwani kurmancî xawindi kultûri weşanxanigatî estin.

We taywetî, îmro ey kultûre zîyetir ha diwû. Kîtiwgeli we kurmancî dîyan firêtin û sendin. Ra eye, ditanim wiwîşim ke vistey kurmancîxwînerî baş e, welê bes nîye. Lûzim hest ke weşanxanigî, nuskarî û xwendevanî zîyetir û eleqadartir win. Vistey zazakî kemî paşmag estin.

Herçeqas ke we î zwane nustin kem îj wû, derfetgeli îmro zîyetir astengker nêwû. Weşanxanigatîyi ey zwane firê hewce ye wîyay zîyekirdin û wilawkirdin. Çe heyf e

ke, zazakîxwînerî kem e. Xwestekar im ke we î lîsanê qedîme esergeli xwêmal û dermal wîyan çapkirdin. Vistey şahzênî / şêxbizinî je yekeli din xerawtir e. Îmegel ke xawinddarî î zwane nekirdîn, çe heyf e ke vistey xerawtir îj ha wiwû. Ra eye, çeqas ke je destiman dîyay, we î zwane kultûri nustine zîyetir ha wikerîn û wîyarîne xetikîki bilûnd. Helwet, ew xetike nuskarî, xwendevanî û weşanxanigatî ye. Zwani şahzênî firê îzolemag estin. Ey îzolewîyine, hem sûdî dage, hem îj zirarî. Welê çe ke wîge, îme xwestekarîyi xwe-man diperistînîn ke ronêsansê ey zwane amade wikerîn.

Kurdîzwangel, xawindi kargeli firê girîng estin ke ra zwanê xwêyan wikerin. Kultûrmendî we zwani xwê pîrûztir estin. Rake, her rîman we zwani vîrit xurttir estin. Ey vista le her der eynî ye. Mêrike, başigîni gî we zwandalikî guman dikerî. Ra ewe, ditanî wiwû kultûrmendî firê baş we zwani xwê. Zwani îme, je hezar salgel ewla ew hatine îmro, îme xwêzin hawîşiman ewkerîn û xawinddarî wikerîn.

Zindeganîyetan rûjnadar wû.

Awayê nivîsê: Rexne û raman

Zimanê nivîsê: Kurdîya şêxbizinî

Şofêrên berê yên alîyê me

Hizir Akbina



Ji gundê Hecilera (Kuşça) kamyona Şixo Önder. Gundî bi kamyonê terin dawetê, Hecilera salên destpêka 1970î.

Di salên 1950-60î de şofêrî (ajokar) li Turkiyê karekî nû bû. Di vî karî de xortên kurdên Anatoliya Navîn jî te de cîh girtin. Xortên me yên zîrek, bêtirs û xebatkar xwe avêtinê pêş û ew wesîte di destê wan de bûnê lîstok. Min jî ji bo Bîrnebûnê ma ew jî di arşivên me de cîh bigirin nivîsek amade kir. Ji destpêkê heta hîro bi dehhezaran malbatên me jîyana xwe bi karê barbirîyê ava kirine.

Ez ê di nivîsa xwe de bi şofêrekî kevn re hevpeyvîneke bikim. Ji bo çend şofêrên berê agahdariya binivîsînim. Min bi Hacî Yusuf Îlhan re hevpeyvîn çekir. Birêz Îlhan di sala 1929an

de li gundê Celikan-Kırıkpinarê jî dayîk bûye. Di zaroktiya/kurikîya xwe de hewesa xwe li ser şofêrîyê çebûye. Wî 40 salan karê Şofêrtîyê kiriye. Bi sedan kes wek şofêr perwerde kirine. Niha li Gölbaşıya Ankarayê dijî. Min pirsî wî bersivên min dan.

Te çawa dest bi karê şofêrtîyê kir?

– Min li eskerîyê dest pê kir. Serleşkerên min bi ajotina min pir memnûn dibûn. Qedra min digirtin. Ez şofêrê serleşkeran bûm. Min ew wesayîte mezin, pêra digotin Reo, jî ajotin û tecrûbên xwe zêde kirin.

Te cara yekemîn çawa ehlîyet girt? Wê demê şert û mercên girtina ehlîyetan çi bûn?

– Li leşkerîyê. Dema min ehlîyeta leşkerîyê girt, serleşkerê me ji me ra got; „Ev tenê li garnîzonê derbasdar e. Ji bo der gereg e hûn ehlîyeta sivil bigirin. Wê çaxê ehlîyet zabitan dida. Serleşkerê me zabite ji bo me hanîn garnîzona me û em kirin ezmûnê/îmtîhanê. Ev pirs ji me pirs kirin.

1. Ji kê re şofêr te gotin?
2. Kamyonekê çend tekerên xwe hene?
3. Çawa şanziman karê xwe dide ser tekeran?

Pirsên din jî hebûn. Ez bi ser ketim û cara yekemîn li Polatîyê ji rexistina zabita ehlîyeta xwe ya sîvil girt. Sala 1955. Numera ehlîyeta min 165 e. Min demekê pê kar kir lê di sala 1955an de sîstema çûnhatinê/trafikê



Hacı Yusuf İlhan

hat çekirin. Dewletê got, ehlîyeta we ya Polatîyê edi derbas nabe. Gereg hû ehlîyeta Ankarayê bigirin. Ez, wê carê jî ketim îmtîhana wê. Bi ser ketim, numera min jî 1264 bû.

We demê rûmeta şofêrîyê çawa bû?

– Dema me de şofêr kêmbûn. Kesên perên xwe hebûn siftê şofêrê xwe pêyda dikir, li paş jî weseyîta xwe dikirî. Dema em diçûn gundekî axa û began em xêrhatî dikirin û em li mala xwe dikirin mêvan.



Te kîjan salê cara yekemîn arebe kirî û modela xwe çî bû?

– Cara yekemîn di sala 1949an de sand, li Haymanayê qeyîte trafîkê kir. Numera xwe jî „HAYMANA 11“ bû.

We li herema me çî, kîjan kar dikirin?

– Me hemû barên gundîyan dibir û tanîn. Heywan, zehîre, aş, kereste, çûyîn û hatina qezê. Arebê me am-bûlansên we demê bûn. Kamyonê me arebe bûk û zawa bûn. Otobûs bûn, belefîr bûn, Tren bûn, bi rastî her tişt bûn. Me bi arebê xwe gundî bi barên wan va dibir Haymanayê, di nav Ankara-Konyayê diçûn dihatin. Di rêya kurt de me pir pere qezenç dikirin.

Wê demê kîjan zordariyên we hebûn?

– Dema me pirsên me gelek bûn. Teknolojî qet tunebû. Lastîkên areba kêr bûn. Me lastîk ji Cemiyêta Şofêran bi karne digirtin. Rê wek mîna berê tunebûn. Dema li ser arebe ji aliyê teknîkê de pirs çêbûn, zehmet bû ku em herin bajarê mezin parçê gerez û hoste bînin û dîsa bibin. Mazot li her derê tunebû. Ji ber tunebûna rêyan teker pir diteqîn, me bi pompa destî tiji dikirin. Pir zehmet bû. Zivistanê rê dicemîdin, em mecbûr bûn ku di şêfaqê de derkevin rê.

Wek yek ji koma şofêrên sifê te bi kê re kar kir?

– Kesên wek şofêr li dor gundên me kêr bûn, em çend kes bûn. Dikanim li ser wan te agahdar bikim. Ji ber me Xalê Memiş hebû ehlîyêta xwe hebû lê wesîta xwe tûnebû.

Kısa Ömer Filikçi (1868-1944). Ji gundê Încowê ye. Wek pîrê şofêrên Anatolîya Navîn tê naskirin. Dema xwe de barbirin û anîn bi hêştiran kiriye. Di navbera bajarên de bi kerwanê hêştiran mûj, hêcîr, çîr, xwê û barên din dibirine. Di belgeyên em-laqa Încowê de hatiye nivîsandin. Dema êdî kerwanê heştiran têrê barkişandine nekirine ji Almanyayê kamyonê ji şirketa Fordê kiriye. Ew kamyon lawên wî Haci Ömer û Mustafa bi kar anîne. Ev malbat li Încowê bi xûdan kamyon tê nasîn. Dema behsa komyona hat kirin malbata Filikçiya tê ziman. Di sala 1955an de beledîyê bar kişandina bar ya li ser kamyonê qedexa kiriye lê demeke şunda dîsa hatiye serbestkirin.

Deli Hesen (1927-1995). Şofêrekî aliyê Kuluyê bû. Şofêrî li eskerîyê hînbûbû. Demekê li Beledîya Cihanbeylîyê kar kir. Dema li gund kesekî



kamyon nedizanîn, Deli Hesên bi kamyonê kirî dertê tê. Gundî li rê mêze dikin, li hev mêze dikin û dibêjin: „Tiştêkî tê yix....“ Kesekî qedirbilind bû. Bi sedan kesan şofêrî hînkirin da.



Halit Durukan (1939-2003): Ji gundê Ankara-Haymana-Bumsizê ye. Şofêrî li eskerîyê hîn bûbû. Dema leşkerî xelas kir û hat gundê xwe şivantî kir. Rojêkê kamyonêk tê gundê

wî û di nav herîyê/çamûrê de dimê. Şofêr nikane wê xelas bike. Şivanê ciwan bi dengêkî nizm dibêje; „Ez dikanim kamyonê we ji çamûrê xelas kim.“ Xudanê kamyonê dibêje; „kerem ke!“ Bi çalekiyêka qurt kamyonê xelas dike. Xudanê kamyonê eceb dimê û jê ra dibêje; “Tu êdî şofêrê min î!” tere bi axê xwe re xeber dide û dest bi şofêrtîyê dike.




Halil Filikçi. Kesên yekemîn in ku li Încowê-Yeniceoba û li Anatoliya Navîn kamyon sandî malbata Filikçi ne. Ji ber vê kesên bi ehlîyêt kamyon ajotî Halil Filikçi ye. Bi gelek kesan şofêrtî hîn kiriye.

Sait Çevik (1930-1981): Li gundê Celikan-Yeşilyurtê hatiyê dinê. Sait di nav cimata şofêran de cîhekî xwe yî taybet hebû. Wî alikariya her kesî dikir. Kesên nas bike an jî nas neke bi



Sait Çevik Ehliyeta devlet ya trafikê 4.7.1955an girtiyê.



Karna kar ya şofêrtiyê

peran an jî manevî piştgirî dida
 însanên me. Bi ditîna min taybet-
 mendîya xwe ya baş, kesekî pir bi
 rêkûpêk û dişiplîn bû. Sait Çevik di
 nav êşîr û gundîyan de gelek dihat

nasîn, kesekî ûsa bû ku ji ber dilger-
 mîya wî hezkirên xwe pir bûn.

Hedî hedî însanên me ketin nav
 karûbarê şofêrtiyê, li dawiyê çend
 kesên din jî bînim ziman rind dibe.
 Wan ji me bi şûnda dest pê kirin.
 Ji Omera lawê Hacı Bayram-Şah
 İsmail, ji Cûtika/Tuzyaka Habîb
 Savran, ji Bozanê Tevfik Sürer, ji
 İncowê Halîl Kart, ji Kûtiga Cemalî
 Gulê û Mehmet Avcı (Mamê
 Reşo), ji Burunağilê-Şehabettin
 Yüksel, Ji Xelika-Karacadağê Reşit
 Canpolat û çendên din jî hebûn.



Ji İncowê kamyona Osman Bekar (1965-1975)

***Niþsa duyemîn:* Fahri Yıldız:** Me, bi zehmetîyên niþsa yekemîn kêfa niþsa duyemîn kir. Demên me yên pir bi zehmet jî yên pir baş jî hebûn. Di nav cimata me de em kesên bi rûmet bûn. Qet bîr nakim dema ez bizewicim gotine; „yê kamyonê bajo, keçika me birçî nîle“ ew gotina rûmeta şofêrtîyê ye. Ez bi rêz û hezkirineka mezin şofêrên niþsa ber me bi bîr tînim.

***Niþsa sêyemîn:* Fevzi Yıldız:** Ji aliyê teknikê de zehmetîyên me kêma bûn. Arebê me li gor rewşê dibûn otêla me, dibûn lokanta me. Di dema me de her malekê kêmanî şofêrekî xwe hebû. Niþşên ber me gelek zehmetî dîtin. Di arebê de bi tûpê gazê vexistinê bi sedan kes mirine, jehrî bûnê, şewat çebûne. Di dema me de rêyên Avrûpa, Irak û Îranê vebûn. Me bar dibirin dût. Dewara me pir baş dibû. Spasdarê niþşên kevn im.

***Niþsa çaremîn:* Sevcan Akbina:** “Şofêrtîyê li alîkî berde, xeyalên me yên li areban sîyarbûnê hebûn. Dem hat bi sedan bûk û keçikên kurdên Anatolîya Navîn hatin Avrûpayê û li vir arebên lux dîtin an jî nas kirin. Me li dawetên xwe xeyal dikirin ku li areba bûkê sîyarbin û berva jîyaneka nû herin. Lê hîro pi-

ranîya me şofêrên arebên lux in. Kêf kêfî me ye dev ji me berdin! Bi hezaran keç bûk kêfa xwe dikin.

Berîvan Keskin: Ji paşerojê heya roja îroyîn jinên kurd bi zîrektî û jêhatîbûna xwe nam dane dunyayê, mil bi mil bi mêran re xebat meşandine. Yek ji wan karên jinê KAN dikirî ajokarîbû. Herçiyes jinan ajokarî wekî xebatekê nemeşandibin û derê rêyên dût neketibin jî li nava gund bi traktorên bavê xwe kar û xebatên malê yên mîna zevî, bax û bûstanan dimeşandin.

Wekî hûn jî dizanin piranîya KAN bi salan e li welatên Awrupayê dijîn. Mîna ku me li jor jî nivîsî hewesa ajokarîyê tim bi jinan re hebû, bi saya îmkân û derfetên Awrupayê niþsa çaremîn ya jinên Anatolîya Navîn di warê ajokarîyê de pêşveçûyînek xweyîqedr bi dest xist. Îro hema hema her jinê belge-nameya ajokarîyê bi dest xistiye. Bi vê yekê re xwebawerî û avantajên xebatên cudatir yên mîna ajokarîya servîsên dibistan û birin û anîna nexweşa jî ava bûn. Îro li welatê Almanayê hin jinên ji gundê Încow û Kelhasanê ajokarîya nexweş û zarokên dibistanê dikin. Her-

wiha ajokariya jinan li karê malê
yên rojane ê mîna birin û anîna
zarokên xwe dibistanê, temînkirina
pedivîyên mal û zarokan, çûyîna
welêt ya bi siwareyê jî bi kêr tê.
Êdî di nav kurdên Anatolîya Navîn
de karê şofêrtîyê nemaye an jî gelek

kêm bûye. Di gelek qezeyên trafîkê
de ciwanên me jî mirine. Pir
malmêrat man e, dayik û bav bê
lav, jin bê mêr û kurik bê bav man
e. Di şînan de jî jinên şare li ser
mirîyan kilam strane. Di kilameka
me de li ser şofêr veng hatîye gotin.

„ *Bê qurban tu qayin nîne ca tu bira ye*
Keke, tu dîregê du mala ye
Kamyona şewitî wergerîyaye
Kral şofêrê we di bin de maye

.....

Bê qurban rêya şewitî bi kopri ye
Bê ez dizanim qe kamyon sewa te kirîye
Bê savci, hakîm li ser te top bûn
Got; eywax eywax va çito gencî kurmanc mirîyê^{ac}

Pêkenok:

Hızır Akbina

Jina aşvan

Li gundekî kurdên Anatolîya Navîn, mêrekî bi jina xwe va genim û zavarê xwe li erabê xwe sûwar dikin, terin gundekî ji van 20 km dûr, êş. Noba xwe digirin, dema noba êş tê wan, siftê genimê xwe lêdikin, dûra zavarê xwe lêdikin, aşê xwe xelas dikin. Dema dor hate dûrandina devî çalan, jina mêrik devî çalan bi şûjinê dûtûre. Mêrê wê şeytanîyekê difikire. Bixwe bixwe dibêje “*jina min acaba ji min hez dike an hez nake?*” Tere dikeve xaniyê aşvan û kincê aşvan li xwe dike. Telika wan dide serê xwe û tê hêla jina xwe, mêze dike. Jina wî jî li mêrê xwe digerê, li dor alîyên xwe mêze dike. Jina xwe ra dibê:

– Xangê tu li çi dinêrî?

– *Welle min mêrê xwe wenda kir.*

– Mêrê te gundî bû an jî cindî(medenî) bû?

– *Welle brango, ez nizamim gundî çi ye, cindî çi ye!*

– Yê cindî, ji jinên xwe hez dikin, qîmeta wan dizanin, jê re dibêjin; rûha min! cana min! dila min! Yê gundî jî, li jina xwe zulmîyê dikin. Wê re dibêjin; kê m bibê ji hemberî min! Tu namirî ku ez ji te xelas bim.

– *Brango ez niha ji te ra çi bibejim (li junîya xwe dixê) û dibêje; him gundî bû, him jî cindî bû!*

Çarîn

Mûlla Evîndar

Çar çarîn,
ji dil barîn!..

ZARÊ MIN

Zimanê min kurdî ye
Zarava kurmancî ye
Zarê min reşwanî ye
Barê min dildarî ye

PORÊ DIRÊJ

Porê dirêj li ser mil e
Ev biska xwe ya reş şil e
Evîna min barê dil e
Dil dinale wek bilbil e

LI ZOZANÊ

Li ser avê dîsa yar e
Li hêla avê çinar e
Li sîya çinar dildar e
Li dilan dîsa bihar e

DÎLBER

Çûm bajarê Diyarbekir
Min dî dîlberek wek şekir
Min dilê xwe jê re vekir
Lê çi bikim wê ferq nekir

Ji vir û ji wê

-ÇEND KURTENIVÎS-

Nuh Ateş

Hec Reco û Çelo

Gava ku Çelo ji mala xwe viderket, girminîya denge doholê vi dinyayê dida, mîna ku bibêjî herd di bin lingê merivan da dilerizî. Bi zara-vayê (sîwarkirina) bûkê yê ku zûr-neyê li çar alîyên gund belav dikir, meriv zîz dibû.

Çelo berve mala hevalê xwe yê ji dil û can, Meho diçû. Wî serî ba kir û di ber xwe da got: „Çi duzan û dunyake neheq e, di herde reş we! Ez î sîh sali me, ji avûrûyê tuneyî û xizanîyê, yê li jor, zewacek nekire nesive min! Lê stû di bin va biwe, Hec Reco va cara siseya ku dize-wicê!“

Kes nizane kingê, belkî sed salî di ber vê, Hec Reco serdarê/reisê gunde xwe bûye. Ew meriveki qelav, neheq, zalim, dev û doxinsist bûye.

Çelo jî ji zulma wî tam kiriye. Li gor qalkirinê, wî li keleka zevîya Hec Reco pêzê xelkê diçêrendiya. Pezî pir birçî bûye û ketîye zevîya Hec Reco. Çelo bi şîya nekiriye pêz zebt bike. Ji ber vê, Hec Reco Çelo kişandiyê odeyê û ramedandiyê fe-

leqayê, pir ezîyet pê kiriye, zihêf û lomeyên nemayî jê ra kirina.

Çelo, Meho û dostê her duyan, Çermo, her se li odeyeke piçûk ya mala Meho rûniştine. Wan qala dohol, zewac û ziluma Hec Reco kirine. Meho weki efsûn-karekî jêhatî dihatiye naskirin. Bi efsûna giredana devê gur û lêgirê-dana zaveyan berî şeva gêrdegê jî bi navûdeng bûye.

Çermo gotiye, „Meho tu ware bi efsûna xwe li Hec Reco girê-de!“ Çelo bi vê gotinê şa bûye û bi eşqekê Çermo tesdîq kiriye û daye ser, gotiye, “erê, walehî bilehî rewa ye. Lê girêde, lê ne tenê ji bo şeva gêrdegê, ji ebedîyê ra li girêde û hetta, ku tu bi gorê min bîkî, devî wî jî girê de!“

Meho û Çermo bi gotinên Çelo kenîyane. Meho gotiye, „Dêv çing girêdim, dibe?“ Çelo lêvegerandiyê, gotiye: „Çima nabe, malneketno, devî Hec Reco deh caran ji yê gur xerawtir e. Ya bibe, tu girêde, Xwedê qewûl bike, ku nekiriye jî ew î bi dilê xwe ye!“

Semîramis, Amîtîs, Aştoret, ...

Zûva ye, min kitabeke bi zimanê almanî kirîbû. Nivîskara wê, Petra Eisele ye û navê kîtabê, „Babylon“ e.
(1)

Babîl di eslê xwe da bajardewleteke Sumerî bû. Bi gomana xanim Eisele, Sumerî ji aliyê Hîndîstanê hatine û li Başûrê Mezepotamyayê bi cîûwar bûne. Pir qewiman (milet) li ser herdê Babîlê hukimdarî kirine û şop cihîştine. Sumer, Amorî, Elam, Akad, Kasî (Kasît), Asur, Keldanî, Fars... Kasî li Babîlê 400 salî hukimdar bûne.

Di vê kîtabê da çend mijaran meyla min kişand û dixwazim kurt qala wan bikim. Yek ji wan, Baxçeyên Semîramisê yên dardakirî (Berwarî/Terasî) ye. Ev baxçeyan bi vî navî di nav heft şaheserên dunyayê yên serdema entîq da cîh digirin.

Li gor agahiyên di kîtaba xanim Eisele da, navlêkirina van baxçeyan wekî „Baxçeyên Semîramisê“ ne rast e. Di eslê xwe da, li gor hayadarîyên hen dirokzanan (nimûne; Diodor, Flavius Josephus), qiralê Babîlê Nebukednaser ev baxçeyan sewa xatirê jina xwe, keybanû Amîtîsê daye çêkirin. Amîtîs keça qiralê

Împeretoriya Medan, Keyakser e. Sewa ku Amîtîs bêriya welatê xwe, Medyaya çiyayî neke, baxçe di forma berwarkî-teraskî da hatine çêkirin.

Keyakser bi qiralê Babîlê, Nabûpûlaser va li dijî dewleta Asûr tîfaqê çêdike. Di saye vê tîfaqê da hukimdarîya Asûr li herêmetê şikandin. Zewaca lawê qiralê Babîlê, Nebukednaser bi keça qiralê Medan, Amîtîsê va encama vê tîfaqê bûye...

Di eslê xwe da, li wê heremê qiralîçeyêke bi navî Semîramîs hebûye. Ew yeke wekî qeda, sehrbaz, bi çînûçortan bûye. Ew ê ji malbateke jê rêze û pir bi şohret (bedew) bûye. Bi çîn û çortana û di saya rindîya xwe da bi rêya zewaca bûye qiralîçeya Asurîya. Navê wê yê esil Samuramet e û jina Şamşî-Adad yê pencemîn bûye. Hen yonanîyan ji paşê da jê ra gotina Semîramîs û baxçeyên berwarî kirine malê wê.

Di kîtabê da, qala xwedewendan (tanriça), ibadetxane, rehîb û rehîbeyan, kar û rola wan li Babîlê tê kirin. Bi vê va girêdayî, tê gotin ku li keleka hen mabedên dînî kismekî ji rehîb û rehîbeyan yên li dawîya merdiwana hiyerarşiyê, bi rûda karê

⁽¹⁾Petra Eisele, 1980, Scherz Verlag, *Bern und München*

orispitî bireva dibirine. Dîrokzan Herodot jî qala vê „edêta neçê“ kiriye. Belkî ji ber vê ye ku di hen metinên dînî yên yahudî-xiristiyanî da qala vê mijarê hatiye kirin.

Bi vê va giredeayî, navê çend Xwedewendên (tanriçeya) oryantal di kîtabê da hatine nivîsîn: Aschtoret, Anath, Aschera û Athtar. Li derdora Mabedxaneyên wan jî, ev „karên neçê“ dihatiye kirin.

Balkeş e, kî dizane belkî tesaduf be, navê Aschtoret (Aştoret) di kurmancîya Anatolîya Navîn da wekî aşoret heye. Aşoret ji bo kesên ku kar û kirinên neçê dikin tê gotin. Bilêvkirina wê tozîkê hatiye gûher-tin, herfa t ya pêşî ketiye û lewma wekî aş(t)oret tê gotin: „Te çi xwe kiriye aşoret!“ Yan jî, „Wêhey, xwe kiriye aşoret!“ Di kurmancîya hen Kurdên Anatolîyayê da herfa t pir cara dikeve. Nimûne, di bilêvkirina gotin yan navên wekî, strî, stu û stran da jî, herfa t jêda dikeve, strî dibe sirî, stu dibe su, stran dibe si-

ran û hwd. Gotina Eşoret pir cara jin dibên.

Kurdî û hawara Mehmet Bulgan

Serokê Komeleya Perwerdeyî ya Ziman, Dîrok û Lekolînên Zanîyarî (SER-DER), Mehmet Bulgan, sewa zimanê kurdî bange serokên şahredarîyan û HDP kiriye. Bulgan gotiye, “li bajarên kurdan li her gund û meheleyê, wekî dema helbijartinan, wezîfê bê dayîn ku ji bo amedekirina qursên kurdî xebat bihê kirin. Kurdî bi tehlukeweka mezin va rûbirû ye!”

Bulgan gotiye, “li hen şahredarîyan sewa kurdî xebat tên kirin lêbîlem ev bi kêmanî ye. Ya ku em dixwazin li şehradarîyên kurdan, li her tax û gundekî qursek bihê amedekirin, dê û bav bèn teşwîq kirin. Ji ber ku va rewşa bi hebûna me ra eleqedar e.”

Banga Bulgan bi eslê xwe ji her partî û her cure rêxistinên kurdan ra ye jî.

Tiştên ku winda dibin - Dawetên berê

Fatos Koyuncuer Brunner

Ku yek ji min bipirse da ku di jiyana me kurdên Anatolîya Navîn de herî zêde çi hatiye guhartin, bersiva min teqez „dawetên me“ be.

Ew çend sal in gelekî edetên ecêb û tewşomeşwo derdikevin holê. Ez ew sê çar sal in haya xwe didim dawetan û tiştên di derbara dawetan de. Her car ji nû ve mat dimêm. Berê dawet li gundan pêk dihatin, li ber mala zava. Niha kes bi dawetên li gundan qayil nabe. Herkes dixwaze dawetê xwe li salonên bajaran pêk bîne. Nizanim ji bo çi ew guhertin diqewime? Qey êdî li gundan xwezîya xwe bi dawetên kurdên Anatolîya Navîn ên ku li Ewrûpa pêk tînin? Ji ber ku li gundan herkes zindî li dawetên me yen ku li vir tînin pîrozkirin temaşê dike. Kişandin û belavkirina linkên dawetan ji êdî edetke nû ye. Tê bîra min dema ku min sala berê daweta xwe kir, gelek meriv û nasên me ji min jî link xwestibûn. Dema ku min got daweta min zindî nayê parvekirin, gelek ji wan mat man û xeyidîn jî. Bi ya min em li vir bi awayakî ji yê li welêt re dibin mînakên nebaş. Berê me şikir dikir ku li dawetên malbata me wênekêş yan jî kameramanek hebû. Dema ku dawet bi şikleke dihatin qeydkirin, me şikir dikir û hewl dida ku tenê demên

dawetê yê girîng û watedar werin qeydkirin. Niha ne wisa ye, herkes bi telefonên xwe tijî xwe dawetan qeyd û parve dike. Min bi xwe pir ji temaşakirina dawetên berê hez dikir. Min kasetên dawetan kom dikirin û li wan dinêrî. Ew qeyd bi qîmet bûn. Me êdî ew jî winda kirin, mixabin!

Nikarim fêhm bikim ku çima li dawetên ku li nava gund pêk tînin ew kincên qut û qol tînin lixwekirin? Berê herkes bi tumanên (şalwar) xwe diçûn dawetan. Hemî keçan tumanên xwe yê dawetan hebûn. Gelo kê bihiştîye ku li gundan li ser erdê xalî tînin rexistin? Bes ji bo ku lingên keç û qîzan gemarî nebin. Ma em çima derfetê bidin ku ew cil û bergên wan ku ew rojê du sê caran diguherin, gemarî bibin? Bêguman ew jî watedar in. Bawer dikim ku qet nedihat bîra kesî ku li derva li ber mala zava sehneyeke biheybet were rêxistin. Di nav wê sehneyê de ji wêneyên bûk û zava werin daliqandin. Bûk berê ji hindirê malê dernediket, tenê ji bo ku bikeve nav govendê diçû derva û dû re hema winda dibû. Niha li ber wê sehneya ku tê rêxistin, cihê bûk û zava heye, ji serî dawetê de heta dawîyê li wir li hemberî mêvanên rûdinin. Li Ewrûpayê berkûk jî hene êdî, wek edetên rojavayî, giştik bi kincên ji

yek rengîn û şikle, dikevin pey bûkê. Ewqas dûrî edet û rewşa me ne ku ew tişt, mirov nikare lê binêre, çavên mirovî kor dibin. Lê bawer dikim ku ez tenê ji wan tiştan aciz dibim, ji ber ku herkes di nav wan dawetên nûjen de gelekî bextiyar xuya dike.

Bûkên berê fêdok bûn, ew bi zorê dixistin nav govendê. Dema ku diketin govendê jî, serê wan tim di ber wan de bû. Serê xwe careke ranedikirin û li derdora xwe nedinêrîn. Eyb bû û ne normal bû ku bûk li ber herkesî destê xwe bixe nav destê zava. Niha bûk daweta xwe bi xwe şên dikin. Ji serî dawetê de heta dawîyê bi tenê govenda xwe dikişînin. Ew jî bi min ecêb tê. Berê digotin divê bûk giran bibin, bûkên niha ne wisa ne, begûman kes terbiya wan pirsyar nake, lê ez nikarim ji wan re hurmetê bigirim. Bi min ne wek bûkên berê giran in û rêzgir in.

Berê dawet sêyan çar rojan didomîn, niha rojek yan jî dû rojan diajon. Lê tiştê herî ecêb ew e ku piştî derxistina bûkê jî dawet didome. Li roja ku bûk ji mala bavê xwe tê mala zava, dawet heta êvarê didome. Berê bûk roja dawetê ya dawîn dihat derxistin û pê re jî dawet diqediya. Her kes belav dibû. Niha ew edet nemaye. Kes êdî xwarinên dawetê jî li mala xwe nakelîne. Ji bajaran sparîş dikin. Li dema berê dawetan bi danîna nanê nivro yê ku malbata zava dike-

land, dest pê dikir û wisa jî diqediyar.

Dengê dahol û zirne gelekî xweş bû berê, niha ew jî tunene. Kes tenezûla wan nake. Her kes bang li stranbêjên navdar dike. Dawet dibin cihê nîmandinê. Filan kesî li dawetê xwe ew stranbêj aniye, divê em ji wî baştir bibin, em dikarin stranbêjekî ji Ewrûpayê jî bînin, gelo çi me ji wan kême? Dawet bi ya min bûne cihê hevberitîyê. Dîsa jî kêfa min pir jê re tê ku hevalên bûk an zava yên biyanî jî tevî dawetan dibin, her çi qas ku em edetên ku ne yên me ne, pêşkeşî wan dikin.

Mixabin wek gelekî tiştên din, ew edetên me yên bêhempa jî winda dibin. Nizanim an ez gelekî kevneparêz im yan gelê me gelekî nûjen e. Ez ji sêzdehsalîya xwe vir de tumanan li xwe dikim û bi wan li gund diçim her dawetê jî. Lê ew pênc salan di nav keç û qizên gund de bi tumanê wek pîrekê xuya dikim. Matmayî li min jî dinêrin. Wek ku bixwazin bibêjin, binêre ji Ewrûpayê tê lê wek pîran tevdiqere. Ez dibêjim, dîsa jî ya min ji wan tiştên tewşomewşo baştir e. Hêvîdar im ku em deh bist salan şûn de wan edetên xwe bi temamî winda nekin. Ji bo niha sebra min bi muzîka kurdî ya ku ji dawetan kême nabe, tê. Ku rojeke ew jî winda bibe, em ê êdî xwe ji tevde winda bikin.

Quto

roja payîzî
li welatî dûr
keçeke pordirêj kenîya

stêrkek rijîya
pisik mat ma
qedehêke vala

dengî dohlê
ji dûrê da tê
rengî zerî xweş e

bayê biharê
bînên bedewa
karên baş

porsipîyê li beroj
keyf xweş e
dengî bilûrê

dohl û zirna
ezmanê serxoş
çîyayê rûnerm

Seyfi Doğan

pitpitik
li dor alîyê lambê civîyan
rêberî yên xwe tunebûn

gotinên xweş
dilê teze
rîya ronî

roj yeka
dizî xwemala
berxê li ber kozê

Çendî payîz bihûrî

Dema şevê roj di gorê hilveşand
Em ê ji birînên xwe biwelîdin
Çendî payîz bihûrî û ferwêrdîn hat
Çendî gul û sosinan zîl dan
Em ê kul û birînên xwe bi firên hehecikan bikewînin
Em ê nema li payîzan pel biweşînin.

Ji birînan re bîranîn divên

Belê rast e ji birînan re bîranîn divîya bûn
Min bi lez û bez çî ji biharê mabe berhev kir
Bêhna gulan, dengê çivîkan
Hêlînên bi şaxan ve qûç kir li qorzikên dil de.
Dibe ku payîza îsal dûvdirêj be
Ne ku ji payîzê aciz dibim
Bi qesî ku ez hez ji rengê payîzê ê zeroşkî
Û ji pêjna baranê dikim
Ne hez ji rengên biharê
Ne jî sîya darên havînê dikim
Lê belê pêjna tenêtîyek kujer
Bi bayê bezê ji dûr ve tê lewre
„ji birînan re bîranîn divên“

Çêrokeke almanî ji yên Grîmm

|Ez Vê çêrokê dîyarî şagirtên dersa kurdî û mamosteyên wan li bajarê Schweinfurtê-Almanya dikim!|

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

Kumsorik

Çi hewûye û çî tunewûye, keçikeke piçûk û şîrîn hewûye. Her kesî, ku vi ber çavê kê diketiyê, ji wê hez dikiriyê. Lê ji her kesî pirtir dapîra wê jê hez dikiriyê. Dapîr şaş dibûye çî bide wê, dixwastiye her tiştî bide wê.

Carekê wê kumekî sor ji qedîfe dîyarî newîya xwe kiriye. Çima ku kum rind lê hatiye, wê qet nexwastiye ku tiştekî din bide serê xwe. Lewma jê ra gotine Kumsorik.

Rojekê dêya wê bang kiriye û gotiye: „Kumsorik ware, aha ji te ra parçeyek paste û şûşeyek mey, wana helna û bibe ji dapîra xwe ra. Ew ê nexwaş e, bêteqad e û ya pê were xwe. Zû bi rê keve, hîn ku heyam germ nebûye. Gava ku tu gihêştî jor, rind û bi edeb here, avarê nebe, ku te wer nekir tu ya gêr bibî û şûşe bişikenî û destbêtal herî ba dapîra xwe. Gava ku tu ketî odeya wê, ji bîr meke berê bibê, roja te bi xêr be û berê xwe hema mede her qunceki û vir û wê tev mede!“

„Ez dixwazim her tiştî rast bikim!“ Kumsorikê ji dayika xwe ra got û destê xwe da ser destê wê. De tu ware wê, mala dapîrê nîv seatê dûrî Gund, li daristanê bûye.

Gava ku Kumsorik gihêştîye daristanê, Gur raste wê hatiye. Lê Kumsorikê nedizanîye ku ew heywanekî çawa zîyankar e û jê netirsîyaye.

Gur: Roja te bi xêr Kumsorik!

Kumsorik: Pir sipas!

Gur: Evqas zû berve ku heldikişeyî?

Kumsorik: Diherim ba dapîra xwe!



Şagirtên darsa kurdî li bajarê Schweinfurtê-Almanya

Gur: Di bin bervanka xwe da çi vedişêrî?

Kumsorik: Paste û mey. Doh me nan lêxistibû. Ev jî ji bo dapîrê ye, xizana min ew ê nexweş e, bêteqad e, boyî ku ew pê ware xwe, qeym bibel!

Gur: Mala dapîra te li ku derê ye, Kumsorik?

Kumsorik: Li nav Daristanê ye, çareyek seat dûrî vira ye! Li bin sê darberûya ye, li wê derê ye mala wê, li jêr wê devîyên gwîzê heye, tu ê bizanî.

Gur xwebixwe ra weha fikirî: „Ev a teze û nermok parîyekî bi bezûkiz e, ev a ji pîrê xwaştir be! Gerek e tu bi qurnazî nêzikî bibî, sewa ku tu her duyan jî bi dest bixî!“

Ew gavekê bi Kumsorikê va meşîya û paşê got: “Kumsorik, carekê li kulîlkên hane rindik yên li derdora me mêze bike! Çima tu li derdora xwe nanihêrî? Bawer dikim tu qet nabihîzî ku çûçik çing xwaşik distrên? Tu ji xwebixwe ra diherî, mîna ku tu diherî dibistanê û xwedîmal bûyîna li daristanê pir şên e.”

Kumsorikê çavên xwe vekirin, gava wê tirêjên rojê yên ku di navberên daran ra vir da û wê da vedilîstin û her derên bi

kulîlkên bedew xemilandî didîtin, ji xwebixwe ra got: “Bi desteyek kulîlkên teze dapîra pir pê şa bibe, hîn zû ye û têr wexta min heye!” Û ew ji rêya xwe bi derket, kete nava daristanê û dest pê lêgerîn û berehevkirina kulîlkan kir. Û her ku wê yek jê dikir, ji xwebixwe ra digot, gaveke din biçim hîn yê çêtir raste min bihên, û weha bi nava kurahîya daristanê da meşîya.

Lê gur rasterast çû mala dapîrê û li derîyê wê xist. „Kî ye ew ê ku li dêrî dixê?” „Kumsorik e, ji te ra paste û meyê tînim, dêrî veke!” „Pelê destikê dêrî ke!” dapîrê lêvegerand û got, “Ez bê-teqed im û nikanim rabim ser xwe!” Gur pelê destikê dêrî kir, derî ji hev bû û bê yî ku deng bike ew rasterast çû ser nivînê dapîrê û wî ew daqurtand. Dûv ra wî kincê dapîrê li xwe kirin û kûmê wê da serîyê xwe, kete nav nivînê wê û perde kişandin.

Lê Kumsorik ketibû pêy kulîlkan. Gava ku wê viqasî ew bikane kaş bike kulîlk berehev kirin, dapîr hate bîra wê û hema dev da rêya mala dapîrê. Ew ecêb ma ku derîyê mala dapîrê vekirî bû. Wexta ku kete hundirê malê, bi wê ecêb hat, ji xwebixe ra weha fikirî: „Wehêy Xwedee, çima ez îro evqas tirsokî bûme, halbuku ez bi hatina ba dapîrê tim şa dibûm!” Wê bang kir got, „Sibeya te bi xêr“, lê tu bersiv wernegirt. Paşê ew çû ber nivîna wê û perde paşva kişandin. Dapîr di nav nivîna da bû û kumik kişandibû ser rûyên xwe û pê ecêb xûya dikir.

– Wêy, dapîr guhên te çima evqas dirêj in!

– Sewa ku te baş bibihîzim!

– Wêy, dapîr çavên te çima evqas gir in!

– Sewa ku bikanim te rind bibînim!

– Wêy, dapîr destên te çima evqas gir in!

– Sewa ku te rind hembêz bikim!

– Lê dapîr, devî te çima evqas gir û ecêb e!

– Sewa ku bikanim te rind bixwim!

Di pêy vê gotinê va gur ji nav nivînê hemleyek da xwe û



Kumsorik daqultand. Ji têrbûnê bi şûnda Gur dîsa xwe li ser nivînê dirêj kir, kete xewê û destpê xorexoreke pir bilind kir. Di wê navberê da nêçîrvan di hêla malê ra derbas dibû û ji xwebixwe ra got: „Pîrejin çawa dikê xorexor! Pêwîst e ez herim bi ser wê ra mêze bikim, ka derdekî wê heye!“ Ew kete hundirê malê û gava ku hate ber nivîna, wî dît ku gur tê da ye. „Ez ê te li vira jî bibînim, kevne gunekar!“ , wî got. Dûv ra wî da ser û got, „ez zûva ye li te digirim!“ Wî xwast bo kûştinê flîntaye berve wî bike lê di wê navberê da, ji xwebixwe ra got, „belkî gur dapîr xwaribe û meriv dê bikane wê xelas bike!“ û gule neavêt. Wî meqesek helna û destpê qelaştina zikê gur yê ku di xew da bû, kir. Gava ku wî sê û çar bir bi meqesê kirin, biriqîna kumê sorik dît û ji çend birên din şûnda, keçik viderket. Ew qîrî û got: „Ax, ez çiqas veciniqîyam, çiqas tarî bû di zikê gur da!“ Dûv ra dapîr jî xwaş derket lê wê bi zehmet nefes dikişand. Kumsorikê

bi lez kevirên gir berehevkin û avandin zike gur. Gava ku gur bi xwe hêsîya, hewl da ku baz bide, lê kevir evqas giran bûn ew di bin barê wan da kete erdê û mir.

Her sisê jî şa bûn. Nêçîrvan çêrme gur gurand û ew helna çû mal. Dapîrê pasta xwar û mey vexwar yên ku Kumsorikê anîbûn û pê hatibû xwe. Kumsorikê wer difikirî: "Tu qet careke din bi tenê serî xwe ji rê bidernakevî û naçî daristanê, gava dayê ev li te qedexe kiribe!"

Li gor qalkirinê, carekê din jî, gava ku Kumsorikê ji dapîrê ra paste dibirîye, gurekî din raste wê hatiye pê ra deng kiriye û xwastiye ku wê ji rê viderbixe. Kumsorikê xwe hêvişandiye, rasterast bi rêya xwe da çûye û ji dapîrê ra gotiye, ew raste gur hatiye û wî silav daye lê neçê li wê mêze kiriye: "Ku ne li ser rêya vekirî bûya, wî ez a bixwarima." Dapîrê gotiye, "Were em dêrî kilîd bikin sewa ku ew nikanibe bikeve hundir!"

Pêçêk neçûye, gur li dêrî xistiye û gotiye: "Dêri ji hev bike dapîr, ez Kumsorik im, min ji te ra paste anîye!" Lê ew bêdeng dimînin û dêrî ji hev nakin. Gurê sergewr çend caran di dor malê ra bi xûşinî çerx dibe û paşê bazdide ser xênî. Wî dixwast çavderî bike û gava ku êvarê Kumsorik here mal, bi dûv de, di tarîyê da wê bixwe. Lê dapîrê di fena gur anîbû derê. Li pêş male curnekî avê yî gir hewû. Dapîrê ji Kumsorikê ra got: "Min doh suncik kelandin. Ava wan hîn germ e. Helbike helne pê ava kaş bike û berde curn!" Kumsorikê av kişand û curn tijî kir. Bihna suncika ji avê belav bû gihêşte pozê gur. Wî poz dikişand û stuyê xwe evqas zêde berve jêr dirêj kir lê nikanî xwe zept bike. Ew terişî û kete curn û tê da vetişî. Kumsorik bi rehetî çû mal. Ji hîngê pê da tu kesî êdî nerindî li wê nekir.

Ziman

Ziman mezin e, heq e.
Bixwun e, ezber ke, bîr meke!
Zimanê hindavrupa, pak e
Nasnekirin tunne, bîr meke
Bibêje kilam, çêka stranekê.
Doze dayika, şîna, bîr meke!
Herkesî zimana xwe,
Kimlixa (Nasmane) xwe!

Abdulgazi Xalisinan



Ji gundê Odabaşîya Çeltika Konyayê

Em canbeg in

(Devoka kurmancîya canbegî)

Em canbeg in, wefakar in
Derd giran in, cefakar in ...
Çend sal in ji hev qetîne,
Ji yekbûnê re
Xizmetkar in.

Ey Felek
Derdê te çî ye,
Qesta te hezar salî çî ye?
Te em çar parçe kirin,
De bes e...
Va eziyeta çî ye?

Rûniştin qeder nîye,
Ji her derdê ra çare heye.
Werin hevalno,
Em bibin yek
Eyrilix, xeyrîlix çare ne ye.
Em bûne çel perçe.
Gurbet e, hezar sal e!
De bes e, hevalno!...

Canbeg hatin ji Xoresanê,
Mola dan li Adiyamanê.
Xêr nedan zalima
Ew şandin.
Barkirin bahar û zivistanê.

Bîrnekin, em canbeg in,
Ku em bîr bikin, em ne yek in.
Li eslî me jî em gelek xwaş,
Ku em bibin yek,
Em bibin xwaş xwaş.

Ro, terine, sal terine...
Li omrî me omr terine.
Em gî yek in,
Em gî pismam û dotmam in.
Ez li welatî Konyayê,
Bang dikim.
Li ku derê canbeg hene,
Silav dikim...

Abdulbaki Xalisinan



Ji gundê Odabaşîya
Çeltika Konyayê

Çend stran ji gundê Hesina (Gundekî Bilika)

Berhevkar: Mehtab Îdelî

Kinê
Kinem kin bû lê kin kinê
Ji min kintir oyyy oyy
Kinem kin bû lê kin kinê
Ji min kintir oyyy oyy
Ez geriya bûm lê kin kinê (2)
Ji te pir tir oyyy oyy (2)
Nav qewaxa lê lê kinê (2)
Nav qewaxa oyyy oyy (2)
Hêşin dike lê lê kin ê perî baxa (2)
Bi min navîk lê lê kinê
Şîrin ref e oyyy oyy (2)
Hatime ser te lê lê kinê
Bi dol û def e oyyy oyy (2)
Pişokf firî lê lê kinê (2)
Sîng sedef e oyyy oyy (2)
Kin fîncala lê lê kinê
Kin fîncala lê lê
Kin fîncala lê lê kinê
Ser tebexa oyyy oyy

Kinem kin bû lê kin kinê
Ji min kintir oyyy oyy
Kinê min kin bû lê cahîlê
Ji te kin tir oyyy oyy
Ez geriya bûm ax lê kinê
Ji te pir tir oyyy oyy
Ez geriya bûm lê kin kinê (2)
Ji te pir tir oyyy oyy (2)
Min kes nedît lê kin kinê
Ji te rindtir oyyy oyy

Qet kes nedît lê kin kinê
Ji te rindtir oyyy oyy
Bi min navîk lê kin kinê (2)
Te bû Naz e oyyy oyy (2)
Hatime ser te lê kin kinê
Bi dol û bi saz e oyyy oyy
Hatime ba te ax lê kinê
Bi dol û bi saz e oyyy oyy
Pişkov filtî lê kin kinê
Sîng toqaz e oyyy oyy
Dugme qatî lê kin kinê
sîng toqaz e oyyy oyy

Ax lê kinê lê kin kinê
Kin qaynexê oyyy oyy
Gêndi piçûk e lê kin kinê
Dîl oynaxê oyyy oyy
Bi min navîk te kin kinê
Te rabike oyyy oyy(2)
Di ber bêl de ax lê kinê
Şênî lêke oyyy oyy
Di paşîlê de ax lê kinê
Cot memik e oyyy oyy
Memikê sorûk lê kin kinê
Di devê min ke oyyy oyy
Ecemî me ax lê kinê
Min hu bike oyyy oyy

Dengbêj: Abûzerê Ebdûrehmen
(Abûzer Balci)

Gotin: Îmedê Mala Bekê (Îmed Îdelî)

2) Keçik bûk di gund de neman
Gî xemilîn hatin ketin dawetê
Go ya min te maye loo
Go lo qiyamet e looo

Ez ê dibêm çolê li çolistanê
Lê sefilî balêsan im
Go tu mirî lê seba devik nan e
Lê erebê lê erbetê lê şîrinê lê, lê şerbetê

Min gotiye; keçik bûk di gunda neman
Gî xemilîn hatin ketin dawetê
Go lawê pîrê looo,
Go ketiye bîrê looo
Go bîr mecîqî looo,
Go lawê pîrê çav pelciqî

Gotiye; lê şarê lê, dêlka giranê
Tu xwanga mêranî lê
Tu xwûçka şêranî lê
Go te dilê kekî xwe yê(i) dudilî
Kekê dayê dîna lê
Go ew ê ber çavê kekê
Kî de kînanê
Lê erebê, lê erbetê lê, şîrinê lê lê şerbetê

Gotin: Muftê Elê

3) Çûn dikane Helebê (2)
Tu bi dil bê, ez bi kezebê (2)
Neyike li nav erebê (2)

Bazde serî govendê
Te govende me xeland (2)
Te malik li me şewitand
Ax lê dînê nexweş im
Tay tay dînê nexweş im
Axx dikim xwîn vedirşim (2)
Derdê te re bê heş im lê
Derdê te re bê heş im
Ax lê dînê Zêynebê
Tay lê dînê zeynebê
Bazda serî govendê lê
Bazda serî govendê
Te govenda me xeland
Te malik li me şewitand
Gotin: Muftê Elê

4) Şênaya min gul gul, şênaya min (2)
Tu bi gul bî li ber bêhna min (2)
Tu li va hişêna bûyê (2)
Tu malê ji min re nakî
Şênaya min gul gul, şeniya min (2)
Aşancî hat aşî xwe dîne (dayîne) (2)
Bi tane, bi tane birjîne (2)
Qeziyak hate kevirî te (2)
Tu hesab ke bistîne (2)
Şênaya min gul gul, şênaya min.

Gotin: Hecî Mistî Hesê (Haci
Ödevci) û Muftê Elê

Kerpîç

Perîn Esmەرöglu

Xem û xof û tirsek bênav û meçhûl ketibû dilê şênîyên koridor û menzelan. Tirsek ku wan bi xwe jî navê wê nizanibû.

Qeştoyê reben gepek penêr di nav devê wî da, postê serê wî jê rabûyî ji mirinê jî xerabtir xwe ji nav lepê cinawir xelas kiribû. Bi xêra dergevan, ku jê re derî vekiribû, xwe avêtibû hundir.

Ji xwe ji Tevnê û ji dermanê wê yê ji hezar kulîlk û çêreyan nebûya, xelasbûna Qeşto tunebû.

Mişkên belengaz ji ber tirs û xofa vî cinawirî, bêçare mabûn xwe avêtibûn ber deriyê Sêrebenda pîr.

Sêrebendê guhdariya wan kir û li kitêba pîroz nihêrî ku têde navek li vî cinawirî hatiye danîn: Kafxelo. Xwedê û Xwedawendan ew ji dogehê şandibû ser van mişkên munafiq.

Hirço ku di nav mişkan de yê herî gir û xurt bû, xwest gelê xwe ji wî hovê dirinde yê perincokî û nehperûşk xelas bike. Hirço bi xatirxwestin û halan û tilîlî û sirûd û

stranan berê xwe da malên însanan ku Kafxelo li wir dima.

Sêlêya jina Hirço dest li hewa bi lavayî û dua û niyazan li benda Hirço bû. Lê Hirço li hember Kafxelo ji mirinê xelas nebûbû, hûrdiryayî, parsûşikestî û serî lê pelixî bû.

Şênîyên korîdor û menzelan bêçare mabûn, rîsipî û kezîsipî û çend aqilmendan biryar girtin da ku ji birayên xwe yên çolê alîkarîyê bixwazin.

Bi hezar zehmetî Qeşto xwe gihandibû cem birayên xwe yên çolê. Mişkên çolê ji ber ku girtir û xurttir bûn, di nav mehlûqatên xeternak da dijîyan û li hember van dirindeyan li ber xwe didan.

Dînoyê mişkê çolê hatibû hawara birayên xwe, lê mixabin Kafxeloyê dirinde ew jî parçe kiribû. Şênîyên korîdorê ji ber tirs û xofa Kafxelo, bêhêvî û bêçare mabûn. Dîsa vegeerîyan cem Sêrebendê û xwe avêtin bextê wê.

Sêrebendê qesreke mezin bi mişkan da çêkirin, li gor dilê xwe jî hinek mişk ji bo qesra xwe hilbijart, hinek bûn karmend û hinek bûn leşker û hinek jî serleşker. Û piştî demekê Sêrebendê bi rêya van mişkên qesrê, jiyana şênîya mişkan ji mirinê jî xerabtir kir.

Yên ku li hember Sêrebendê derdiketin, simbêlên wan dihat rûçikandin û guhên wan dihatin jêkirin, yan jî dihatin kuştin, yan jî diavêtin korîdora mirinê.

Rojekê ji şênîyan yek meytê Kafxelo dibîne û tê ji Kewarê berpirsyarê embarê re dibêje ku Kafxelo mirîye. Lê mirina wî tê veşartin û bi varyanteke din tê behskirin, ji bo ku bawerîya şênîyan neşikê û her alîkarîya Sêrebend û Xweda û Xwedawendan bikin.

Qeşto û yên ku hatibûn avêtin bo korîdora mirinê, yekîtîyek çêkirin û bi alîkarîya şênîyan serî hildan û ketin qesrê.

Vê carê jî şênîyan ji bo Qeşto û serhildêran qesrek mezintir ava kirin. Û divê rewşa şênîyan êdî baştir bibûya. Lê mixabin qet welê nebû, mişkên feqir feqirtir bûn, yên birçî birçîtir bûn, yên bêçare zeftir bûn. Yên li qesra mezin jî bi xwarin û vexwarinê, bûbûn wek hûtan û ji

ber qelawîya wan qesr û perestgeh û dadgehên wan xwe hilnegirtin û hilweşîyan.

Mirov hemû hestên însanî û mişkanî wek ken, girî, kêf û şahî, tirs û xof, rezilî û belengazî, bîndestî û serdestî, kuştin û mirin, qelsî û xurtî, mervantî û dostanî, dijminatî û neyartî, xwebexşandin, serhildan, berxwedan û raperîn, bêbextî û hevaltî, jiyaneke xedar, hiyerarşîyeke bêsînor di vê berhema hêja de dibîne û pêre dijî.

Qehremanên berhemê bi xwe jî bi navê xwe û bi karên xwe pir balkêş in.

Rindêya Dadger li hember neheqîyan derdikeve lê bi tenê dimîne û xwe dîkuje. Lê zimanê fermî dibêje ku ji ber "pirsgirêkên derûnî" dawî li jiyana xwe anîye.


Dodoyê Tembûrvan ew jî ji ber zilm û neheqîyên ku li şênîyan dibe, berê xwe dide korîdora mirinê.

Qoloyê wênesaz poçika xwe jêkiribû kiribû firçe, mezinan jê dixwestin ku wêneyê wan çêke lê wî tiştên din çêdikir. Kesî ji tabloyên wî fam nedikir.

Navên din yên ku balkêş in: Pûrto, Îsko, Hirço, Kewar, Zîvoyê Nivîskar, Reşoyê Şanoger, Çûro, Zîvê, Zûro, Sêncô, Qeroyê Çilek,

Zigo, Zengoyê Guhmezin, Zûroyê Rûşewitî, Peşko, Hêko û gelek navên din.

Berhemeke pir serkevî ye, herikbar û hestyar e, îronîk e.



Ahmed Bilge: ji 1994an û vir de di zindanê de ye.

Kerpîç, roman,
Weşanên APECê,
2020, Stockholm, 206 r

Efrin

M. Hasko

Şûnza, warê darzêtûn e
Bi şengebî û beybûn e
Bi royê re peydabûne
Welatê man û hebûn e

Efrîn jar û xemgîne
Dilşikest û bi birîne
Pî û bask lê şkîne

Dilkêş e, rind û bihuşt e
Hêlîna ji xewnan, mişt e
Çivîka bi hawar û qîşt e
Bê xwedî ma, û bê pişt e

Ji dest bê bavan dinal e
Dirinde yî bi ser de zal e
Jiyana lê , tûj û tal e
Şev û roj di bîr û bal e

Lê hêwirîn hirç û heftar
Dizin, nûkerin bê hefsar
Bêjîn e, war bû tar û mar
Bê rewîştin, rûtin wek mar

Efrîn kurdewarî



Ji gundê Hecîlera (Kuşça) kamyona Şixo Önder. Gundî bi kamyonê terin dawetê, Hecîlera salên destpêka 1970î.